Amed, Karûbarên Herêmî û Hişê Hevbeş

Rapora Civînê

2024 – Amed

NAVEROK

Kurtebirên Navan..... **Hata! Yer işareti tanımlanmamış.**

Vekirin..... **Hata! Yer işareti tanımlanmamış.**

Amed, Karûbarên Herêmî û Hişê Hevbeş..... **Hata! Yer işareti tanımlanmamış.**

Rapora Pêşnîyazên Plana Stratejîk ji bo Şaredarîyan..... **Hata! Yer işareti tanımlanmamış.**

Di Çareserkirina Pirsgirêkên Bajêr de Şaredarî û Polîtîka..... **Hata! Yer işareti tanımlanmamış.**

Pêşnîyazên Plana Stratejîk ji bo Şaredarîyan: Tevkarî û Pirsyar..... **Hata! Yer işareti tanımlanmamış.**

Pêşnîyazên Plana Stratejîk ji bo Şaredarîyan: Bersiv
..... **Hata! Yer işareti tanımlanmamış.**

KURTEBIRÊN NAVAN

- AFAD – Midûrîyeta Afetê û Rewşa Lezgîn
- AKOM - Navenda Hevrêzkirina Afetê
- DEM PARTÎ - Partîya Wekhevî û Demokrasî ya Gelan
- DÎMDER - Komeleya Muteahîdên Avahîsazîyê ya Amedê
- DÎSA - Navenda Lêkolînên Sîyasî û Civakî ya Amedê
- DÎTAM - Navenda Lêkolînên Civakî ya Dîcleyê
- DSÎ - Karûbarên Avê yên Dewletê
- DTSO - Odeya Bazirganî û Pîşesazîyê ya Amedê
- EED - Fonên Ewropî ji bo Demokrasîyê
- GABB - Yekîtîya Şaredarîyên Herêma Başûrê Rojhilatê Anadolûyê
- GES - Santrala Enerjîyê ya Rojê
- GSMH - Berhema Neteweyî ya Safî ya Xeyrî
- HEVRA - Navenda Piştgirî û Şêwîrê ya Hevrayê
- KAÎP - Planên Îmarê yên yên ji bo Parastinê
- KAMİAD - Komeleya Muteahîdan û Karsazên yên Cemawerîyê
- KSS - Qada Pîşesazîyê ya Biçûk
- MED-DER - Komeleya Lêkolînên Ziman û Çanda Mezopotamyayê
- NEET - Ciwanên ne di Perwerdehîyê û ne jî di Îstihdamê de
- OSB - Qada Pîşesazîyê ya Organîzeyê
- STO - Rêxistinên Civaka Sivîl
- TMMOB - Yekîtîya Odeyên Endazyar û Mîmaran a Tirk
- TOKİ - Rêveberîya Avahîyên Komî
- UNESCO - Rêxistina Perwerde, Zanist û Çandê ya Neteweyên Yekbûyî

Mesût Azizoğlu - **Serokê Lijneya Rêvebir a DÎTAM'ê**

Mêvanên hêja, Hevşaredarên Şaredarîya Mezin a Amedê Serra Bûcak û Dogan Hatûn, Hevşaredarên Şaredarîya Sûr, Rezan, Peyas û Şaredarîya Yenîşehîrê, serok û rêvebirên hêja yên rêxistinên civaka sivîl û hevalên hêja yên çapemenîyê, hûn hemû bi xêr hatin.

Di vê civînê de ku em bi navê "Amed, Karûbarên Herêmî û Hişê Hevbeş" li dar dixin de rêxistinên civaka sivîl û rêveberên hilbijartî yên Amedê li hev civîyan. Berî ku armanca civîna îroyîn vebêjim, berî her tiştî dixwazim ji we re behsa destpêka vê projeyê bikim.

Wekî DÎTAM, di Kanûna 2023'yan de me dest bi xebatekê kir ku sernavê wê "Amed di Karûbarên Herêmî de Çi Winda Dike?" bû. Amedê hin tişt winda dikirin, loma armanca me ya vê xebatê ew bû ku em bi tevş civakê, bi xebat û agahîyên civaka sivîl re vê rewşa windakirin û paşvegerrê ya li Amedê berbiçav bikin.

Di 6-7'ê Çileya 2024'an de, li Amedê em teqrîben bi 80 sazî û kesan re li ser çar sernivîsan civînên bi sernavê "Tespîtkirina Pirsgirêkên Amedê û Pêşnîyazên Çareserîyê" li dar xistin. Em encamên vê xebatê yên li ser mijarên "Bajar, Jîngeh û Mîrasa Çandî", "Jîyana Sosyo-Çandî û Polîtîkayên Wê", "Rewşa Aborî û Geşedana Gundan", û "Jin, Ciwan û Zarok" bi sernavê "Amed di Karûbarên Herêmî de Çi Winda Dike?" raport kirin. Ev rapor di 27'ê Sibata 2024'an de li Amedê di civînekê de bi raya giştî re hat parvekirin û me ew da ber gengeşeyê.

Paşê ji bo em vê xebatê, veguherînin avanîyeke berdewamî, me veguherand projeyekê. Me vê projeyê bi navê "Tora Şopandina Karûbarên Herêmî" ku ji bo em salekê bidomînin, me doza alîkarîyê li sazîya European Endowment for Democracy (EED) kir û hat qebûlkirin.

Civîna yekem a bi navê 'Amed, Karûbarên Herêmî û Hişê Hevbeş' du armancên xwe hene: Armanca yekem; ragihandina "Tora Lêkolîna Karûbarên Herêmî", bi we re parvekirina armanca torê û awayê xebata wê û wergirtina pêşnîyazên we yên der barê torê de. Armanca duyem jî; pêşnîyaz û tespîtên di rapora ku me di Sibata 2024'an de bi sernavê "Amed di Karûbarên Herêmî de Çi Winda Dike?" amade kiribû de, wekî tevkarîya civaka sivîl a li plana stratejîk a şaredarîyê berpêş bikin û tevî şaredaran em bi we re van mijaran gengeşe bikin.

Di xebata Tora Şopandina Karûbarên Herêmî de em armanc dikin ku xwe bigihînin encamên jêrîn:

✓ Zêdebûna rola rêxistinên civaka sivîl di mekanîzmayên biryargirtinê yên herêmî de,
✓ Tevkarîya li pêşketina hevkarîya di navbera şaredarîyan û STO'yan de û tevkarîya li polîtîkayeke bajarî ya bedewamîyî ya bi hişekî hevbeş,
✓ Ji alîyê STO'yan ve der barê şaredarîyan de xebatên şopandin-nirxandinê,
✓ Di asta herêmî û neteweyî de ragihandina pirsgirêkan ji bo sazî û kesan û ji bo kes û sazîyên têkildar têkildarî pirsgirêkan çareserîyan pêş bixin çûna bi ser wan de,
✓ Zêdekirina tecrûbe û beşdarîya civaka sivîl di çareserîya pirsgirêkên bajarî de.
Şêweya kar û rêbaza tora lêkolînê jî wiha hat plankirin:
✓ Endamên torê dê ji rêxistinên civaka sivîl, akademîsyenan û çalakvanan pêk bê,
✓ Di nav salekê de, sê mehan carekê civînên lêkolîn û nirxandinê yên temayî dê bên lidarxistin,
✓ Li civînan dê pispor, akademîsyen û rêxistinên têkildar bên vexwendin,
✓ Piştî her civînê dê bi piştgirîya pisporan raporeke lêkolîn û nirxandinê bê amadekirin,
✓ Rapor dê bi dest an jî bi rêya e-nameyê ji şaredarîyan û STO'yan re bê şandin.

Pêşnîyaz û tevkarîyên ku di civînan bên pêşkêş kirin dê şêweya kar û armanca vê torê di formeke rast û domdar de pêk bîne.

Tesbît û pêşnîyazên ku di xebata me ya bi sernavê "Amed di Karûbarên Herêmî de Çi Winda Dike?" de hatibûn danîn, di civînê de bi navê "Pêşnîyazên Plana Stratejîk ji bo Şaredarîyan" hatin parvekirin. Encamên vê xebatê ku bi tevkarîya teqrîben 80 kes û sazîyan hatibû çêkirin, wekî dosye hatin amadekirin. Piştî pêşkêşkirina aborîzan Mehmet Aslan, li ser vê mijarê nîqaş hatin kirin. Agahîyên di raporê de, nîşanî me dan ku mixabin rewşa heyî ya Amedê nebaş e.

Di dawîyê de, dixwazim bibêjim ku wekî DÎTAM me çima têkildarî karûbarên herêmî xebatek kir. Pêşqebûleke me hemûyan heye ku dewlet, ji damezrandina komarê heya niha, bi zanebûnî herêmên ku Kurd lê dijîn paşguh kirîye. Jixwe îstatîstîkên ku sazîyên fermî yên di warê aborî, tenduristî, perwerdehî û qadên din de weşandine jî vê paşguhkirinê nîşan didin.

Piştî vê xala destpêkê ya dezavantajî ya di warê Kurdî de, nêvenge pevçûnî ya 40 salên dawî û pêkanînên qeyûm ên piştî tiştên di 2015'an de qewimîn jî, di warê karûbarên herêmî û şaredarîyên de hîn bêtir bûn sedema kêmasîyan.

Neh salên ku di bin rêveberîya îdarekarên cemawerîyê yên bi rabirdûya bajêr, çanda bajêr û kuçeyên bajêr nizanibûn û ji gel dûr ketibûn derbas bûn, bûn sedema ku di warê karûbarên herêmî de hîn bêtir pirsgirêk

Di encamê de, ev qewimîn hemû bûn sedem ku Amedê di warê karûbarên şaredarîyê de xizmeteke baş nedît û asta jîyana civakê kêm xist. Ev rewş, li bajarên din ên herêmê jî bû sedema heman tiştî. Ev tenê ne ji bo îro, ji bo siberoja me jî pirsgirêkeke mezin e. Tevî van hemû tiştên neyînî jî, li Amedê kevneşopîyeke civaka sivîl a gelekî bihêz heye. Bi taybetî jî, ji ber nêvenga polîtîk a di salên dawî de, zimanê civaka sivîl jî paraleli vê yekê pir polîtîk bûye.

Em di vê xebata xwe de, armanc dikin ku van kêmasîyên di karûbarên herêmî de ku di nêvenga polîtîk a Amedê de kêm tên nîqaşkirin û kêm tên dîtin, bêtir berbiçav bikin. Her wiha em dixwazin karûbarên şaredarîyê yên li vir û yên li rojavayê Tirkîyeyê jî bidin ber hev. Em armanc dikin ku xebatên ku civaka sivîl dike û agahîyên wê yên teknîkî bêtir berbiçav bikin û bigihînin sazîyên navendî û sîyaseta herêmî. Em hewl didin ku agahîyên ku civaka sivîl hildiberîne, bikin naveroka zimanê sîyasetmedaran.

Sernavê civîna "Amed, Karûbarên Herêmî û Hişê Hevbeş" e. A rast, meseleya herî girîng, di serî de karûbarên herêmî û bi giştî di her qadê de em bibin hevkar û aqilekî hevpar derînin. Belkî zehmet be ku mirov rasterast di mijarên têkildarî sîyasetê de hevkarîyekê zevt bike, lê di mijarên têkildarî karûbarên herêmî de ku rasterast têkildarî qalîteya jîyana me ne hatina cem hev, pir hêsan e. Di warê sîyasetmedaran de jî, gava agahîyên ji xebatên civaka sîvîl dertên û aqilê hevpar, bikin sîyaseta xwe, dê karên rasttir derkevin meydanê.

Ez careke din ji bo beşdarîya wan malavayîya Hevşaredarên Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê Serra Bûcak û Dogan Hatûn, hevşareadrên navçeyan, serok û rêveberên hêja yên civaka sivîl dikim. Her wiha malavayîya hemû sazî û kesên ku tevkarî li amadekarina vê raporê kirine jî dikim.

AMED, KARÛBARÊN HERÊMÎ Û HIŞÊ HEVBEŞ

Sedat Yûrtdaş – Cîgirê Serokatîya DÎTAM'ê (Moderator)

Hûn hemû bi xêr hatin. Îro, li vir civînek girîng bi sernavê "Amed, Karûbarên Herêmî û Hişê Hevbeş" pêk tê. Hevşaredarên Şaredarîya Bajarê Mezin, Hevşaredarên Navçeyan, rêxistinên civaka sivîl, rojnamevan û sazîyên çapemenîyê yên ji Amed û herêmê hûn hemû bi xêr hatine.

Ji ber qeyûman, Amedê 8 salên xwe winda kirin, herêmê jî winda kir. Em hêvîdar in ku ji niha û pê ve, hilbijartî yên gel şaredarîyan bi rê ve bibin. Em ji niha û pê ve jî, qeyûman û pirsgirêkên ku afirnaidne naxwazin li vê herêmê bibînin. Yên berê mexdûr bûn, niha mexdûr bûn. Hêvî dikim ku dîsa heman şaşîyan li vî gelî nekin.

Ez ji bo Pêşnîyazên Plana Stratejîk Ji Bo Şaredarîyan mafê gotinê didim birêz Mehmet Aslan ku zemîna vê xebatê amade kir ku bi beşdarîya zêdetîr 80 kes, pispor û sazîyan agahî, belge û doneyên cidî dide der û di heman demê de moderatorê wê ye.

PÊŞKÊŞKIRINA RAPORA PÊŞNÎYAZÊN PLANA STRATEJÎK JI BO ŞAREDARÎYAN

Mehmet Aslan – Aborînas

Merheba hevalno, beşdarên hêja, endamên çapemenîyê, ez bi rêzdarî we hemûyan yek bi yek bi rêzgirî silav dikim. Ez ê encamên lêkolîneke qadê bi we re parve bikim. Ez ê nêrînên 80 rêxistinên civaka sivîl û 80 STK'yên ku têkildarî bajar, di aborîya bajêr, jîyana civakî ya bajêr û meseleya jin û zarokan de cih girtine parve bikim. Di vê pêvajoyê de tevkarîyên me jî çêbûn.

Di 2–3'ê Çileyê de civînên Koma Nîvendî hatin lidarxistin. Beşdarî li civînan çêbû. Paşê encamên wan civînan hatin raporkirin. Me pûxteya van xebatan amade kir. Ez ê pûxteya raporê pêşkêşî we bikim. Hûn niha di ekranê de wê raporê dibînin.

Serokê Lijneya Rêveberîya DÎTAM'ê Mesut Azîzoglu, Endamên Lijneya Rêveberîyê Sedat Yurtdaş, moderator Nevîn Soyûkaya, Meral Ozdemîr, Dîlan Kaya Taşdelen, Reha Ruhavîoglû tevkarîyeke mezin kirin. Bi taybetî min xwest vê bibêjim.

Amed çi winda dike? Ev, dê çawa bên tasnîfkirin? Em dikarin van çawa daxilî nava plana startejîk a bajêr, a Şaredarîya Bajarê Mezin bikin? Ger xebateke plana stratejîk a Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê ya bi vî rengî hebe, gelo ev dikarin bibin tiştekî hevpar? Bajar, êdî planên xwe yên stratejik bi rêbazên bi vî rengî pêk tînin. Berî ez bêm vir, min li hin planên stratejîk ên hin bajaran mêze kir. Ji bo me mînakeke baş, plana stratejik a Şaredarîya Bajarê Mezin a Îzmîrê ye ku jê re dibêjin Model Îzmîr. Ger wê ji vir xebatek derkeve, wekî îlhama ji wir, ez pêşnîyaz dikim em jê re bejin Model Amed.

Dirûvê Sûrên Amedê û ablema wê ji bo me gelekî girîng e. Divê em vê wekî sembola bajêr bi kar bînin. Amedê hê vê ablemê bi kar neanîye. Ev sembol, dikare veguhere parçeyeke danasîna navneteweyî.

Civîna "Amed, Karûbarên Herêmî û Hişê Hevbeş", di 23'yê Tîrmeha 2024'an de li Amedê hat lidarxistin.

Em dikarin li ser masîkartûxk çîrokan çêbikin an jî em dikarin çîrokên heyî rojane bikin. Di hin efsaneyan de dirûvê masîyê navborî, bi pêxember Yûnûs re tê pêwendkirin. Mirov dikare van tiştan pêş bixe...

Me di civînên koma nîvendî de, Amedê di bin çar sernavan de vekolandin. Ez dikarim bêjim ku em ji jor ve di ser Amedê re çûn. Li vî bajarî çi heye? Îtiraz ji bo çi ne? Tiştên kêm û zêde çi ne? Me xwest em van tiştan binirxînin.

Meseleya "Bajêr, Jîngeh û Mîrateya Çandî", meseleya herî zêde em li ser sekinin. Paşê Ji bo Jin, Ciwan û Zarokan Bajarekî Çawa… Sernavekî me yê din jî "Jîyana Civakî, Çandî û Polîtîka" û em li ser meseleya "Rewşa Aborî û Pêşxistina Gundewarî" ku moderatorîya wê min kir, sekinîn.

Pêşnîyazên ji bo tevkarîyê li planên stratejîk ên şaredarîyan bikin, bi vî rengî ne.

……..

1. Bajar, Jîngeh û Mîrasa Çandî

1.1. Tevna Dîrokî, Çandî û Civakî ya Sûrê

• Xebatên ku bûn sedem avahîyên tescîlkirî yên heyî yên li bajêr û Keleha Amedê û Qada Peyzajê ya Çandî ya Baxçeyên Hevselê têkevin Lîsteya Mîrateya Cîhanê ya Unescoyê, bi piştgirîya xwe ji bo Sûr veguhere tevna xwe ta berê, divê tevna gumlata girav, parsel û sînorên kuçeyan ên paftayên kadastrî yên salan 1954'an esas bên girtin
• Divê Qada Mîrateya Çandî bi awayekî yekpare bê parastin,
• Divê Plana Îmarê ya Nazîmê ya 1/5000 were revîzekirin, divê sînorê KAİP yê li Sûrê daxilî nava Baxçeyên Hevselê bê kirin û KAİP ji nû ve were dîyarkirin,
• Divê Plana Rêveber a Qadê ya Qada Mîrateya Cîhanê ji nû ve bê çêkirin û stratejîyên parastina qadê yên heyî, bi esasgirtina texrîb û xerakirinan ji nû ve bê sererastkirin,
• Hemû planên ku têkildarî qadê bên çêkirin divê bi pêvajoyên zelal û beşdarîyî bên pêkanîn,
• Rapora ku Mîsyona Reaktîf a UNESCO'yê di sala 2023'yan de çêkir û biryarên UNESCO'yê yên têkildarî bê esas bên girtin û bi vî awayî li qadê sererastkirin bên kirin.

1.2. Pirsgirêkên Binesazîyê yên Gihanîyê yên Bajêr

• Li Amed a ku di nava 30 şaredarîyên mezin de ne xwedî rêya hawirdorê ye, ji bo çareserkirina pirsgirêka gihanîyê divê xebatên kartêkertir bên kirin û divê lobîtî û rêyên zorlêkirinê yên sîyasî bên bikaranîn,

• Divê rêyên hawirdorê li gor pêdivîyên rojane werin plankirin û pêkanîn,

• Divê plana gihanîya nava bajêr bê revîzekirin,

• Divê pirgsirêka pergala biray û gihanîya giştî û zêdebûna trafikê bê çareserkirin.

1.3. Divê Di Plansazîya Bajêr De Biryarên Di Asta Navendî De Bên Girtin

---

• Wezareta Jîngeh Bajarsazî û Guherîna Avhewayê û şaredarîvanîya qeyûma, bi awayekî dijqanûnî qadên parkî, qadên reakrasyonê, qadên perwerdehî û tenduristîyê betal kirin û hema bêje wekî ofîseke emlake nirxa erazîyên xwe zêde kirin û ew dan ber firotinê yan jî bi hin revîzyonan rantek çêkirin. Li dijî vê çerxa bertîlê divê pêvajoyên qanûnî bên xebitandin.

• Divê rêveberîyên herêmî, têkildarî çareserkirina vê pirsgirêkê di plan, pêkanîn û biryaran de tevdîrên pêwîst bigirin.

1.4. Pirsgirêkên Binesazîyê yên Bajêr

• Parastina tevna dîrokî û çandî ya Sûrê,

• Ji bo bîra civakî winda nebe, divê biryarên veguherîna bajêr û îstimlaqkirinê bên betalkirin,
• Divê pêkanînên veguherandina bajêr bên sekinandin,
• Di veguherînên bajêr ên mecbûrî de, divê mirov esas bê girtin, mafê mülkîyet û avahîyê esas bê girtin û veguherînên li cihê cih pêk bên,
• Divê rêbaz û amûrên mudaxilkirina nava planên veguherîna bajêr ên di asta navendî an jî herêmî de bên pêşxistin,
• Wekî mînaka Sûr-Farqînê, hewldanên ranta mezin ên ji bo xwedîyên parselên taybet bên astengkirin,
• Divê du projeksîyonên nifûsê de zêdebûneke wekî %50, %100 çêbibe û rêjeyên qada cemawerîyê, qada hêşîn ên bi awayekî taktîtîk hatine kêmkirin bên îfşakirin,
• Divê nifîs û nifûsa projeksîyonî yên di planan de bi awayekî teknîkî bên lêkolînkirin û divê rê û rêbaz bên dîtin ku ranta di encama plansazîyan an jî revîzyonan de çêbibe, li nifûsa di nava revizyon an jî qada guherîn lê tê kirin bi awayekî adil bê belavkirin.

1.5. Pirsgirêka Plana Cihnişîn û Avahîyan

- Tenê ne habitata bajêr a Amedê, divê plan û revîzyonên li ser esasê rantê yên li navçeyan jî bibin rojev.
- Tenê ne pêhesîna di warê pêkanînên rantê dikin armanc de, divê têgiha ‘plansazîya bîrdozî’ jî bibe rojev û bê gengeşekirin,
- Di xebatên li dijî sererastkirinên li hemberî rantê de, tenê hedefgirtina komên berjewendîparêz, carinan dibe sedema ku saîqên polîtîk ên li pişt hin planan ji ber çavan winda bibin û lêhûrbûna li ser sererastkirinên bi armanca ewlehîyê yan jî hedefgirtina tevna dîrokî û engîyê bidin der. Lewma îtirazên çêbibin, divê bi awayekî berfireh û stratejik li ber çavan bên girtin û bi civakê re bên parvekirin.

1.6. Pirsgirêka Afirandina Rantê ya Berjewendîparêz

- Li dijî van avanşyên ku parvekirina rantê dikin tiştekî hevpar, tenê ne bi plansazên bajêr an jî avahîsazan re, divê bi avanîyên beşdarîfireh têkoşîn bê kirin.
- Li hemberî meseleya rantê û îmara polîtîk, divê di warê îcraî û malî de avanîyên (wekî Konseya Bajêr) spasîfîk bên piştgirîkirin.

1.7.Avahîyên Qaçax û Hewldanên Dagirîyê

- Valahîya ji ber nêzîkatîyên ewlehîyê yên rêveberîya navendî û şaredarîvanîya qeyûm çêbûne, di warê dagirîyê û avanhîyên qaçax de vediguhere tevgereke xwezayî û mayinde. Li dijî dagirîyê û “avahîyên qaçax”, divê li nasname, nêrîna polîtîk, networka civakî hwd. a kesê qadê dagir dike neye nêrîn û li dijî vê reflekseke bajarî bê çêkirin,

- Divê bi têgehên wekî “nêzî me ye”, “dûrî me ye” pozîsyonek neye çêkirin û bi vî awayî têgiha “dagirîyê” neyê rewakirin,
- Demildest divê dawî li dagirîyên li Gelîyê Dîcleyê, Baxçeyên Hevselê û Pira Dehderî bê û cihên bên valakirin li gorî avanîya xwezayî bên sererastkirin.

1.8. Di Şikildana Cihnişînê de Çêbûna Hîyerarşîya Çînî

- Li dijî feraseta avahîyê ya bicihbûyî ya li ser esasê muteahîdan, divê di warê pêşanîyên ekolojîk de modelên alternatîf bên hilnberandin,
- Li dijî mîsyona şikildana “dîyarkirina pîyasayê” û daxwazê ya projeyên rantê yên mezin, divê planên alternatîf bên hilberandin,
- Divê bê dîtin ku daxwaz bi awayekî mutleq di şert û mercên pîyaseyê de çênebûne û bi vî awayî ji bo malbatên rewşa wan a aborî nebaş bibin xwedî avahî, arguman û proje bên hilberandin,

1.9. Pirsgirêka Zêdebûna Bêkontrol a Xerckirina Avê

- Ji ber nêzîkatîyên muteahîdan ên esasgirtina malîyetê birêvebirina bikaranîna avê û nêzîkatîyên ekolojîk ên li derveyî planê tên hiştin, divin sedema zêdebûna pirgsirêkên xerckirina avê. Pêşî divê di warê avê de standardeke sîstemîk bê pêşxistin.
- Di warê bikaranîna avê ya bêkontrol û çêkirina sondajan ji bo bîran de, wekî Deşata Konyayê koncal çênebin, divê avên wekî “ava gewr” tên binavkirin bên veguherandin û li plana îmarê nîşeyên mecbûrî bên zêdekirin.

1.10. Astengkirina Çêbûna Îstîhdama Wesfdar a ji Alîyê Avanîbûna Bi Tîpa Sîteyê

- Gava mekanîzmayên hilberandina avahîyan bê xebitandin, divê îstihdamkirina hêz karî ya wesfdar jî wekî parçeyeke vê mekanîzmayê bê sêwirandin.
- Gava li parselên biçûk û navîn, ji bo komên rewşa wan a aborî nebaş avahî bên çêkirin, mirov dikare gelek avahîsaz, endezyar û tekînîkeran îstihdam bike.

1.11. Pirsgirêkên Binesazîya Kêm Li Bajêr

- Hemû planên pergalên binesazîyê, divê li gor pêdivîyên heyî û siberojê yên bajêr, ji alîyê şaredarîyan ve were revîzekirin û pêkanîn,
- Divê pergalên ava paqij û qirêj li gor pêdivîyên roja îroyîn bên nûkirin,
- Ji ber nêzîkatîyên muteahîdan ên esasgirtina malîyetê birêvebirina bikaranîna avê û nêzîkatîyên ekolojîk ên li derveyî planê tên hiştin, dibin sedema zêdebûna pirgsirêkên xerckirina avê. Pêşî divê di warê avê de standardeke sîstemîk bê pêşxistin.
- Avên ku wekî avê gewr tên wesifkirin divê bên veguherandin û ji bo di avdanîyê de bên bikaranîn, divê nîşeyên mecbûrî li plana îmarê bên zêdekirin,

- Her wiha divê çareserîyên şexsî yên li gor bikaranîna duyem û sêyem jî bên pêşxistin, (Wekî ava ji serşûştinê mayî di sîfonê de bê bikaranîn…)

1.12. Bikarhênerîya Avê Baranê

- Deşarjkirina avên baranê, ji bo çareserkirina meseleyên wekî qenalîzasyon, sînyalîzasyon, dawerivandina bîyolojîk xebat,
- Divê li ser rêbazên bikarhênerîya avên barên bê sekinandin ku avên baranê wekî deşarj bên komkirin û bêyî tiştek bê kirin û daxilî qenalîzasyonê bê kirin,
- Li sîteyan û qadên jinûve tên çêkirin divê avên baranê bi projeyan bên bikaranîn û wekî rêbazekê esas bên girtin,
- Ji bo bermayî li Çemê Dîjleyê neyên rijandin divê pergalên binesazîyê yên heyî bên çêkirin û mueyîdeyên cezayî bêyî cudakarî bê kirin bên pêkanîn û ji bo vê hin mekanîzma divên,
- Ji bo Çemê Dîcleyê neye qirêjkirin divê hemû pêkhateyên bajêr ji bo mueyîdeyên bibrîyardar » astengker vekirî bin,

1.13. Pirsgirêka Mudaxileya Li Qadên Hêşîn ên Bajêr

- Amed û Gelîyê Dîcleyê bi awayekî yekpara ekosîstema bajêr pêk tînin. Gelîyê Dîcleyê û Baxçeyên Hevselê, ji ber ku di nava Qada Mîretya Cîhanê de ne, divê bi awayekî yekpare bên nirxandin.
- Divê “Plana Rêveberîya Qadê” ji nû ve bê çêkirin û divê tevdîrên parastina stratejîk bên girtin û pîvanên wê bên danîn û divê hemû stratejîyên qada hêşîn ên bajêr bi awayekî yekpare li gor vê avanîya yekpare bên pêşxistin û mîmarî û peyzaja li gor ekosîstema xwezayî esas bê girtin,
- Bi taybetî divê biryarên ji navendê tên girtin ên ji bo guherandina wesfa qadên hêşîn û planên îmarê, bi dawî bibin,
- “Estetîka bajêr” ji têgiheke navdar wêdetir, divê navenda pêkanînê be,
- Peyzaj divê tenê wekî çandina daran neye dîtin, divê bi awayekî berfireh û sistematik li ser vê mijarê bê sekinandin,
- Gava li refujên navîn darên çam, çinar hwd. bên danîn, divê şaredarî û sazîyên pîşeyî yên têkildar di warê ava ku wê bê xerckirin de xebatên hevpar bimeşînin. Her wiha divê ev xebat qelebalixî, qirêjîya hewayê, meseleya karbondîoksîtê jî bihewîne.
- Divê mîmarîya peyzajê ji xebateke rasthatinî wêdetir be.
- Di pêvajoyên ji bo çêkirina qadên cihnişînê uên nû de ku bêyî li mezinahîya wê bê mêzekirin, divê projeya peyzajê bibe tiştekî emcbûrî û li şûna çareserîyên loqal çareserîyên yekpareyi bên tercîhkirin.

1.14. Pirsgirêka Trafîk û Otoparkê

- Di çêkirina navendên kar, nexweşxane, banka û qadên bazirganîyê yên din ku rê li ber zêdebûna trafîkê vedikin, divê di asta çêkirinê de barê wan ê trafîkê bê hesabkirin,
- Ji bo parkkirina wesayîtan divê standardeke dîyarkirî bê çêkirin,

- Divê ji bo hin qadan pêşînîyek hebe, li dijî parkirinên nerêkûpêk mueyîdeyên cezayî hebin an jî polîtîkayên pêxîmker bên pêkanîn,
- Xespkirina rê û qadên cemawerîyê yên sereke divê bên astengkirin,
- Divê bê dîtin ku nifûsa Amedê ku zêde dibe û avanîya wê ya gihanîyê, bi wesayîtên takekesî nayê mînîmalîzekirin,
- Divê trafik bi pêkanînên mirovî bê piştgirîkirin, mirov ber bi guhanîya giştî ve bê kanalîzekirin û di hin deman de bi rêbazên ku trafîka wesayîtan sînordar dike qadeke jîyanê ya mirovî bê sêwirandin,
- Tora gihanîyê ya nava bajêr, divê ji bo kesên berasteng bi rihetî karibin bi kar bînin bê plankirin û sererastkirin,

1.15. Di Gihanîyê de Pergaleke Li Ser Esasê Peyayan

- Li bajêr divê planeke gihanîyê ya ne li ser esasê wesayîtan, li ser esasê mirovan bê plankirin û pêkanîn,
- Divê dest ji ji pêkanînên ku bajêr dikin du alî û gihanîya peyayan a hember bargiran dikin bê berdan,
- Ji bo bikaranîna serbihuran wekî çandekê berbelav bibe, divê wekî derenceyan tevdîrên ergonomik bên girtin,
- Pêkanînên serbihuran ên bi anasor ên ji bo berastengan, di projeyan de wekî standardekê bên pênasekirin,
- Divê nêrînên yekpare yên ku peyayan teşwqî meşe bikin bên berbelavkirin,
- Di derbasbûna peyayan de divê pêkanînên bideng bên pêkanîn,

1.16. Pirsgirêka Avahîyên Metrûk

- Divê veguherînên bajêr ên tê xwestin di ser metrûkkirinê re bi awayekî de facto bên destpêkirin bên redkirin, ji bo divêtîyên wê Peyman bên çêkirin û pêvajoyên veguherşnê jî di warê mekan û mirîvê de bên plankirin,
- Li Sûrê divê li dijî pêkanîn ku tenê bi awayekî fizîkî mekan diguherînin û ji bo bazirganî, rant, bênasnamekirinê tunekirina bîra dîrokî tên kirin, veguherîneke ku veguherîna ekolojîk esas digire bê pêşxistin,
- Divê tevna sosyo-çandî ya kevneşopîyî ya Sûrê bê parastin,
- Rêveberîya navendî û şaredarî, divê dest ji polîtîkayên veguherşna bajêr û metrûkkirinê berdin û ji bo qad bi awayekî fizîkî, civakî û çandî bê başkirin bi pêvajoyên beşdarîyî proje bên pêşxistin.

1.17. Texrîbatên Li Çem û Gelîyê Dîcleyê

- Çareserkirina pirsgirêkên girêdayî meseleya Gelî û Çemê Dîcleyê, divê pirsgirêka sereke ya bajêr û dînamîkên bajêr be,
- Çûk, masî, kêzik jî di nav de wekî berdewamîya jîyana 635 cureyên candaran, divê xebatên ji bo statuya çem a Çemê Dîcleyê bên kirin,

- Gava statuya qanûnî ya çem bê çêkirin, di vê çarçoveyê de kanên qûmê, dagirîyên der barê çem de, sîstematîka banda parastinê ya 100 metreyî û hwd. divê li gor meseleye esas bên girtin,
- Ji bo çareserkirina meseleyên wekî ava ji Çemê Dîcleyê tê kişandin, bikaranîna qûma çem, bikaranîna qûma çem, bermahîyên li çem tên rijandin, qirêjkirina çem hwd. sîstemek divê,
- Divêtîyeke din a ji bo kêmkirina texrîbatkirina çem jî, Pira Deh Derî jî di nav de, divê destûra çêkirina kafe, restoran û baxçeyên gel neyên dayîn.

1.18. Têkildarî Afetên Wekî Erdhejê Pirsgirêka Plansazîya Afetê

- Ger pêwîst be divê tîmên lêgerîn û rizgarikirinê bên çêkirin û wekî pêdivîyekê bên pênasekirin,
- Divê stoka xetere ya bajêr bê dîyarkirin, envantera avahîyan bê dîyarkirin û li gor rêza xetereyê ewlehîya erdhejê ya hemû avahîyan wekî pîvaneke mecbûrî bê dîyarkirin,
- Ji bo xurtkirina avahîyan, veguherîna bajêr, veguherîna li cihê cih, projeyên avahîyên civakî û hwd. bi odeyên pîşeyî û zanîgehan re nêrîna pisporan bê girtin, sûda cemawerîyê esas bê girtin û terka ferasetên rantparêz bê kirin,
- Ji bo pêşxistina civakî, aborî û mekanî, divê ev pêkanîn bi awayekî yekpare esas bên girtin.

2. Ji Bo Jin, Ciwan û Zarokan Bajarekî Çawa

2.1. Torên Piştevanîyê yên Piştgirîya Jîyaneke Civakî Dikin

• Di serdema pêş de, divê mafê beşdarbûna jin, ciwan û zarokan bi avakirina avahîyên temsîlî yên ji sala 2015an û vir ve ji nû ve were sazkirin.
• Bi rêya van mekanîzmayan, divê pirsgirêkên kesên ku li Sûr, Yenîşehîr, Peyas û Rezanê dijîn rasterast werin destnîşankirin û li gorî vê yekê çareserî werin dabînkirin,
• Piştî avakirina mekanîzmayên rêveberîyê, divê çarçoveyek were dîyarkirin ku ev bajar dê çawa bi jin, ciwan û zarokan re were birêvebirin.
• Bi rêya avahîyên ku bi navê "Kreşa Zimzimê" ji nû ve hatine çêkirin, berdewamîya torên hevgirtinê yên herêmî.
• Berî sala 2012an, odeyên lîstikê yên şaredarîyê hebûn. Dê û bav û zarok dihatin van odeyên lîstikê û malbat û jin pirsgirêkên xwe parve dikirin. Divê hewldana odeya lîstikê ya zarokan ji nû ve were pêkanîn, ji ber ku ew çareserî û pêhesandinê ji bo dêûbavan peyda dikir.
• Ji bo zarok karibin bi hevalên xwe re bi zimanê xwe yê dayikê, li hev bicivin û bilîzin di bin çavdêrîya pisporan de, divê hawirdorek ji bo wan bê dabînkirin,
• Divê Navendên Jîyana Jinan li taxan werin avakirin û deverên ku jin û zarok dikarin sûd jê wergirin werin afirandin.
• Divê avahîyên ku jîyana civakî rêk dixin, hevgirtinê zêde dikin û derfet û qadên ragihandinê yên li gorî pêdivîyên kesan peyda dikin, werin afirandin.
• Li Amedê divê li gorî bajarê zarokan xebat bên kirin,
• Dema ku li bajêr qadên jîyanê bên avakirin, divê ew li gorî taybetmendîyên pêşveçûna laşî û têgihiştinî ya zarokan bên sêwirandin,
• Çêkirina cihên ku zarok û ciwan karibin jîyana xwe ya civakî bi awayekî baş derbas bikin.

2.2. Berbelavbûna Pêgirtîbûna Tiryakî

• Di bikaranîna tiryakê de çêkirina çarçoveyeke ku hemû alîyan dihewîne,

• Berî ji nû ve entegrekirin/rehabîlîtasyona kesên ku madeyên hişber bikartînin ya ji bo nava civakê, divê rêbazeke pêşîlêgirtinê were dîtin da ku pêgirtîyên nû û yên potansîyel ji vê dûr bikevin û ji bo çêbûna vê divê malbat werin teşwîqkirin,
• Divê hişyarîyek bajarî ya 'dij-tiryakê' çêbibe, divê polîtîka bi piştgirîya pisporan werin hilberandin û pêkanîn,
• Ji nû ve çalakkirina sazîya Hevrayê ku di warê pêgirtîbûna tiryakê de li qadê dixebitî,
• Li qadên di bin kontrola şaredarîyê de divê tevdîrên pêşîlêgirtinê bên pêşxistin û xebat bên kirin,
• Li bufe û dikanên li ber dibistanan qedexekirina cixareyên "yeklibî",
• Ji bo kêmkirina bikaranîna tiryakê, divê sazî bi hev re tevbigerin,
• Li ser qadên bikaranîna tiryakê çêkirina lêkolînan,

2.3. Tiryak û Şekildana Sîyasî

• Jinûve avakirina avahîyên civakî ji bo jin, ciwan û zarokan,
• Ji nû ve meşandina xebatên ji bo komên dezavantajî yên bajêr bi rêya avanîyên wekî Konservatuarên Bajêr ên Aram Tîgran û Cegerxwîn, malên piştgirîya perwerdehîyê, çalakîyên werzîşê û Komeleya Sarmaşikê,
• Vekirina Zarokistanan ku rasterast bandorê li pêşveçûna zarokan dikin, avakirina navendên lênêrîna zarokan û qadên lîstikê li taxan,
• Afirandina stratejîyên çareserîyê ji bo pêşîgirtina li bikaranîna tiryakê,
• Analîzkirina nimûneyên ji kanalîzasyonê (analîza ava qirêj) dikare têgihîştinê li ser mezinbûna pirsgirêkê peyda bike. Bi vê rêbazê mirov dikare nexşeyeke tiryakê ya li seranserê bajêr çêbike, giranîya bikaranîna wê ya li gorî semtan bipîve û çareserîyên radîkaltir ji bo semtan pêş bixe,
• Divê avahîyên metruk yên ku wekî cihên bikaranîna tiryakê tên bikaranîn bên tespîtkirin û ji bo van avahîyan tevdîr bên girtin,
• Divê pirsgirêka tiryakê bi awayekî giştî were nirxandin, nasîna zarokan bi tiryakê re, gihîştina wan a tiryakê û teşwîqkirina wan a ber bi sûc ve bi hev re werin nirxandin.

2.4. Jinûve Kontrolkirina Planên Mekan û Bajêr

• Ji bo avakirina bajarekî dostane ji bo kesên astengdar, jin, zarok, ciwan û kesên xwedî pêdivîyên taybet ên ku hewceyê lênêrînê ne, divê planên mekanî û bajar di ber çavan re werin derbaskirin,
• Divê sêwirandin û avakirina qadan ji alîyê rêveberîyên herêmî ve û entegrekirina hemû beşên civakê yên li bajêr wekî polîtîkayeke makro were sêwirandin,
• Ji bo ji sêwirandina mekan re bibin mînak, divê tabelayên muzeyan li bilindahîyeke wiha bin ku zarok karibin bibînin,
• Divê modelên 3D yên qadên civakî yên wekî sînema, şano, muzexane, dibistan, nexweşxane, îstasyon û hwd. bên çêkirin û astengîyên li ber xwegihandina wan bên rakirin û di vî warî de molde bên pêşxistin,
• Dema ku stratejîyên çareserîyê bên pêşxistin, divê pêşbînî û plan bi texmîna ku di navbera 140 û 150 hezar kesên berasteng li bajêr hene, werin çêkirin.

2.5. Sazîyên Jinan Ên Di Dema Qeyûm De Hatin Girtin

• Domandin stargehên jinan, bi taybetî yên ku bêfonksîyon hatine hiştin,

• Ji bo piştgirîya jinan bê kirin, divê pêdivîyên wan ên wekî stargeh û penagehîyê bên dabînkirin,

• Ji bo çareserkirina pirsgirêkên jinan, avakirina stargehan ji bo pêdivîyên wan, an jî berî stargehan çêkirina hin rawestgehan ji bo misogerkirina ewlehîya wan û dabînkirina pêdivîyên wan,

• Divê mekanîzmayên serlêdanê ji bo jinan werin avakirin, ji nû ve werin çalakkirin û ji nû ve werin bicihkirin da ku karê xwe bi awayekî bihêz pêk bînin,

• Divê veguherînek di ferasetö de were afirandin da ku têgihîştinek hesas a ji bo zayendê were avakirin û ev veguherîn divê bi perwerde û çalakîyên curbicur were piştgirîkirin,

• Divê li deverên giştî bûtonên ewlehîyê bên çêkirin ku jin û zarok karibin bi kar bînin. Divê rê û mekanîzmayên parastinê yên ku ew dikarin dema ku di xetereyê de ne xwe bigihînînê ji hêla şaredarîyan ve werin kontrolkirin û pêkanîn,

• Çêkirina budçeyan ji bo jin û zarokan,

• Bi rêya rêveberîyên herêmî û dînamîkên bajêr, afirandina qadên îstihdamê ji bo jinan,

3. Jîyana Sosyo-Çandî û Politîka

3.1. Texrîbata Ji Alîyê Mueseseya Qeyûm Ve Hatine Afirandin û Beşdarîbûn

---

• Divê envantereke objektîf a zirara mirovî, çandî û civakî ya ku ji alîyê rejîma qeyûm ve li bajêr hatîye kirin, were çêkirin,
• Ji bo rêveberîya şaredarîvanîya gelparêz,divê polîtîkayeke beşdarîbûnê di rêveberîyê de were pêkanîn;
• Divê aktorên xwedî ramanên cuda di pêvajoyên biryardanê de cih bigirin,
• Di hilbijartinan de tevlîkirina hemû beşên civakê di rêveberîya bajêr de;
• Hevkarîkirin bi keyayan, odeyên pîşeyî, rêxistinên kedê, rêxistinên civaka sivîl, komele û înîsîyatîfên welatîyan ên xwedî nêrînên cüda,
• Divê sûd ji zanîn, ezmûn û pisporîya ku ji hêla sazîyên çandî û hunerî yên wekî Şanoya Bajêr a Amed, Ma Music, Zarok Ma, Wêjegeh Amed, Amidart, Mordem Sanat û sazîyên nû yên ku li ser projeyên ji bo jin, ciwan û zarokan dixebitin bê girtin,
• Divê ev sazî di hevkarî û şirîkatîya bi rêveberîyên herêmî re roleke çavdêrî û çavdêrîyê bigirin ser xwe,
• Ji bo hevkarîya di navbera rêveberîyên herêmî û civaka sivîl de were xurtkirin, divê ji bo xurtkirina zemîna tevkarîya rêveberîya herêmî û civaka sivîl gav bên avêtin

3.2. Parastina Nasnameya Bajêr

• Divê xebatên ku nasnameya bajêr ya Amedê xurt dikin bên meşandin,
• Divê hewldan ji bo parastina nasnameya piralî ya çandî, zimanî û olî ya bajêr hebin,
• Divê avanîya pirnasnameyî û pir çandî ya bajêr bê parastin û wekî normekê bê qebûlkirin û li gor vê rêveberîyeke bajêr bê pêkanîn,
• Divê dîroka olî û çandî ya bajêr li gor heqîqetê were vegotin û divê polîtîkayeke dîrok-turîzmê ya li ser esasê pirnasnamebûn pirçandîbûna bajêr esas bê girtin,
• Sazî, kes û komên peywendîdar divê bi awayekî çalak beşdarî polîtîkayên têkildarî nasnameya bajêr bibin û ev kes, kom û sazî divê di nav mekanîzmaya îştîşare û çavdêrîyê de cih bigirin da ku nasnameya bajêr biparêzin,
• Bêyî cudakarîya dîn, mezheb, nêrînên felesîf û sîyasî bê kirin, divê mafê xweîfadekirina azad a hemû gel û bawerîyên li bajêr bê pêkanîn.

3.3. Veguherîna Çalakîyên Çand û Hunerî

• Divê sazîyên çand û hunerê yên li bajêr di polîtîkaya çand û hunerê û pêkanîna polîtîkayên ku nasnameya bajêr diparêzin de roleke xurt bilîzin,
• Li gor vê, divê rêveberîyên herêmî, di statuya serbixwe an jî xweser a van sazîyan, mekanîzmayên daxilî hilberîna çand-hunerê pêk bîne,

• Nêzî 8 salan karûbarên çand-hunerê yên şaredarîyê bi temamî guherîne, loma divê hemû xebatên çand û hunerî yên heya niha hatine îhmalkirin bên pêkanîn,
• Divê hilberîna çand û hünere berfirehtir be,
• Divê polîtîkaya çand û hünere ya Amedê bi awayekî demdirêj bê dîyarkirin û polîtîkayeke yekpare esas bê girtin,
• Dîyarkirina polîtîkayan, pêkanîna wan û di pêvajoyên şopandinê de tevkarîya bi hemû sazîyên çandê, rêxistinên civaka sivîk û hevkarên din ên têkildar,
• Divê dînamîkên sivîl ên bajêr di warê polîtîkaya çandê de divê xwedî pzoîsyoneke ku barê rêveberîyên herêmî sivik bikin de bin.

3.4. Rewşa Zimanê Dayikê û Polîtîkaya Zimanê Dayikê

• Rewşa xirab a zimanê Kurdî divê wekî yek ji pirsgirêkên herî lezgîn were dîtin û divê politikayeke yekpare ya li gorî girîngîya pirsgirêkê bi pêkhateyan re were pêşxistin û pêkanîn,
• Divê rêveberîyên herêmî polîtîkayeke zimanî biafirînin û belgeyên polîtîkaya der barê perwerde û bikaranîna zimanê Kurdî de bi nivîskî bin û mirov karibin xwe bigihînin wan,
• Divê xebatên civakî, sîyasî û aborî li bajarên Kurdan bi zimanê Kurdî bên kirin, divê Kurdî bibe zimanê bazarê û divê sazî û alîyên peywendîdar di vî warî de bên teşwîqkirin,
• Divê kreş û navendên perwerdehîyê yên bi zimanê dayikê ji bo zarokan ji nû ve werin vekirin,
• Dema rêveberîyên herêmî van xebatan bikin, divê sazîyên din ên li bajêr, wekî kreşan û hwd. jî daxilî nava xebatan bên kirin,
• Divê navendên lîstikan ên zarokan û kreş ên kurdî, bi pêkanînên curbicur bên teşwqîkirin. Mînak, divê ji bo kreşên ku dixwazin mufredata şaredarîyê ya li kreşên xwe pêk tîne xebatkar, amûr û hwd. bên peydakirin,
• Divê çalakî û şahîyên Kurdî ji bo zarokan li parkan werin lidarxistin,
• Gava berbiçavbûna li qada cemawerîyê ya zimanê Kurdî bê kirin, divê xebatên kurdî bên rûmetyarkirin û rûmeta zimên bê zêdekirin,
• Divê rêveberîyên herêmî bi têgihîştina pêşkêşkirina xizmeta bi zimanê dayikê tevbigerin û xebatkarên ku dikarin xizmetê bi zimanê dayikê bikin îstihdam bikin,
• Divê rêveberîyên herêmî bi weşanxaneyên Kurdî re hevkarîyê bikin, pirtûkên çîrokan ên pirzimanî ji bo zarokan peyda bikin û wan bêpere belav bikin,
• Divê çalakî werin lidarxistin da ku zarok ji bo xwendin û nivîsandina bi zimanê xwe yê dayikê werin teşwîqkirin û bikaranîna zimanê dayikê berbelav bibe,
• Divê derfetên şaredarîyê ji bo kampanyayên dersên bijarte yên zimanê dayikê yên salane yên ku ji bo piştgirîya perwerdehîya pirzimanî ya li ser bingeha zimanê dayikê tên lidarxistin, xizmetên wekî bîboardan û hwd. pêşkêş bikin,
• Divê kampanyayên ku xwendekarên dersên kurdî yên bijarte hildibijêrên teşwîq bikin bên lidarxistin û di warê materyalan de piştgirîya mamosteyan bê kirin,
• Divê rêveberîyên herêmî ji bo zêdekirina prestîja zimanê Kurdî li Amed, herêmê û li seranserê Tirkîyeyê bixebitin.

3.5. Perwerdehî

• Divê rêveberîyên herêmî pêvajoyeke demdirêj plan bikin da ku qalîteya perwerdehîyê li Amedê zêde bibe,
• Li gor daneyên PIS'yê zarokên ku bi zimanê xwe yê dayikê perwerdeyê nabînin, li gor zarokên din ên bi zimanê dayikê perwerde dibin ku çendî din heman polê de bin jî, salekê an jî sal û nîvekê paşdemayî e. Lewma divê perwerdehîya li ser esasê zimanê dayikê, wekî maf û daxwazekê bê dîtin û polîtîkayên li er vî esasî bên pêkanîn,
• Divê bi hevkarîya pispor û sazîyan planeke stratejîk were amadekirin ka meriv çawa dikare qalîteya perwerdehîyê li bajarekî baştir bike û ev plan divê bi hevkarîya sazî û alîyên peywendîdar were pêkanîn,

• Pêkanîna pêdivîyên girîng ên wekî têkoşîna li dijî xizanîyê û xwarina li dibistanê divê ji alîyê şaredarîyan ve were dabînkirin,
• Divê şaredarî li gorî hewcedarîyê sepanên pîlot pêk bînin û belav bikin,
• Divê qursên piştgirîyê li taxên bajêr ên ku rewşa wan a aborî ne baş e bên berbelavkirin û di van qursan de piştgirîya xwarin û lîstikê jî bê peyda kirin,
• Divê bi dînamîkên bajêr re di warê dabînkirina piştgirîya qeydkirinê û bursan de ya alîkarîya xwendekarên zanîngehê bê kirin.

3.6. Tenduristî

• Divê wekî rêgezekê were qebûlkirin û bibe polîtîkayek ku hemû welatî karibin bêpere, bi wekhevî û bi zimanê xwe yê dayikê sûd ji xizmetên tenduristîyê wergirin,

• Xizmetên tenduristîyê yên parastin û pêşîlêgirtinê û xizmetên tenduristîya giştî ya gel divê di nav erkên girîng ên rêveberîyên herêmî de werin hesibandin,

• Divê xebatên ji bo başkirina hişmendîya tenduristîyê ya bajêr bên kirin,

• Ji bo li nexweşxaneyan xizmeta tenduristîyê ya bi zimanê dayikê bê dayîn, divê mekanîzmayeke ku piştgirî, perwerde û teşwîqan ji bo xebatakaran dihewîne bê pêkanîn,

• Divê li ser pirsgirêkên tenduristîyê yên civakê xebatên birêkûpêk werin kirin û bi sazîyên tenduristîyê yên têkildar, ode, rêxistinên sivîl û sendîkayan re lêkolînên hevbeş werin kirin.

4. Rewşa Aborî û Pêşvebirina Gundewarî

4.1. Ji Bo Amedê Xebatên Pêşvebirineke Rast

- Di van rojan de ku têgeh û rêbazên afirandina dahatê diguherin û hişê çêkirî di demeke kurt de bûye parçyeke girîng jîyana rojane de, çêkirina polîtîkayeke ku piştgirîya pêşvebirinê dike û gengeşekirina wê,
- Ji bo sektora pîşesazîyê di warê pêşvebirina bajêr de encamên bandorker biafirîne, divê qadên hilberînê yên şi derî sîteya pîşesazîyê ya 2'yemîn, KSS'yê û herêma pîşesazîya organîzeyê di warê berhemdarîyê de bên analîzkirin,
- Pêşektina girêdayî paradigmaya ku têkildarî sektora pîşesazîyê hatîye çêkirin, divê bê nirxandin ka divîtîyeke yan na,
- Divê ji bo pirsa "Divê rêya rast a pêşvebirina Amedê çi be?" modeleke aborîyê ya rast bê çêkirin,
- Divê nêzîkatîyên ku enerjîya kesk û enerjîya tavê zêde dikin bên pêşxistin,
- Divê ji bo bajêr xebatên teknolojîya navîn û demdirêj bên kirin.
- Li Amedê ku xwedî avantajên veguhêzî yan jî lojîstîkê ye, bi taybetî divê di encama entegrasyona binesazîya lojîstîkê ya bi sektora çandinîyê re, plansazî bên kirin,
- Divê polîtîkayên ku tevkarîyê li polîtîkaya hilberînê ya Amedê dikin bên pêkanîn û hilberîna berhemên çandinîyê û bikaranîna wan bê teşwqîkirin.

4.2. Pirsgirêkên Di Sektora Çandinîyê De

• Divê çarçoveya gişti ya sektora çandinîyê were lêkolînkirin û divê hevsengîya di navbera çandinîya kevneşopî û ya nûjen de bi hev re were nirxandin,
• Divê polîtîkayeke pêşketin û guhertinê di çandinî an jî pîşesazîya çandinîyê de were pêkanîn û divê di vî warî de sûd ji akademîsyenan bê giritn,
• Li seranserê cîhanê pêşanîyên çandinîyê bi lez diguherin û çandinîya aborî her roj dibe pêşanîyeke cidî. Cîhan ber bi ku ve diçe? Geşedanên di çandinîya bêerd de çi ne? Sepanên sewalvanîyê yên bi nêzîkatîyên înovatîf tên pêşxistin, çandinîya biaqil û derfetên avdanîya biaqil çi ne? Di heyamên ku di avhewayê d eguherînên esktrem çêdibin de, xebatên îslehkirina tovan ên li ser esasê hawirdor, avahewa û hişkesalîyê di çi astê de ne? Divê xebatên têkildarî van pirsan bên kirin.
• Divê ji bo xebatên zanîngehê, bi taybetî yên di hin mijaran de û ji bo berhemên çandinîyê yên rreqatbeker xebat bên kirin û ji bo pêşxistina berhemên nû xebat bên kirin,
• Ji bo Amedê nirxandina potansîyelên ernejîya jeotermalê,
• Ji bo pîşesazîya çandinîyê ya bajêr bê çêkirin û xurtkirin û ji bo nansameyeke çandinîya reqabetker, divê xebat bên kirin,
• Ji bo serwerîya di bazarê de û înîsyatîfa dîyarkirina fîyetan de, divê xebatên depoyên bilîsans bên kirin.

3. Pirsgirêkên Sektorî

- Divê bê nîqaşkirin ku sektora turîzmê ya pêkhateyeke girîng a sektora xizmetê ye, dê ji bo pêşvebirina bajêr çawa veguhere dînamîkekê,
- Gava mirov li paya sektoran a di nava GSMH'yê de dinêre Amed bajarek e ku xizmetê hildiberîne; divê ev hilberandina xizmetê veguhere xzimeteke wesfdar,
- Ji bo zêdekirin asta aramîya civakî, divê Amed di warê lojîstîkê de bê analîzkirin,
- Divê Amed bi tevkarîya di xizmeta sektorê de bê dîtin û li gor vê projeksîyonên bajêr bên çêkirin,
- Ji bo bajêr veguhere navendeke lojîstîkê di warê pîşesazîya çandinîyê de divê xebat bên kirin,
- Ger bajêr veguhere navendeke lojîstîkê, dê bibe sedema ku veguhere navendeke stratejîlk a xeleka tedarike kontrol dike,
- Ji bo bajar wekî markeyekê bebriçav bibe, divê ji bo xizmetên wekî depokirin, veguhastin, muayene û çavdêrî, xeleka sar, depokirina bilîsasn, qadên stokê û karûbarên sîhgorta û gumrukê û heta radeyekê pkêtkirin û ambalajkirinê xebat bên kirin,
- Divê di ser turîzm û îxracatê ku du pêkhateyên sektora xizmetê ne lêhûrbûn çêbibe,
- Divê polîtîkayên ji bo pêşvebirina qada gundewarîyî bên pêkanîn.

4.4. Pirsgirêkên Di Sektora Pîşesazîyê De

- Binesazîya pîşesazîyê tenê ne rêbejehî, gihanîya hewayê an jî rêhesin û xwegihandina lîmanê ye, her wiha divê xebatên çêkirina parselên pîşesazîyê jî bên çêkirin,
- Li gel OSB'yan divê ji bo pêşxistina KSS'yan jî polîtîkayên çalak bên çêkirin,
- Di mînaka erazîyên ku wekî parselên pîşesazîyê tên tahsîskirin lê paşê wekî qada TOKÎ'yê hatine veguherandin, ji bo bi dest bikevin divê nêzîkatîyên biryardar bên pêşxistin,

4.5. Pirsgirêka Ku Şaredarî Li Derî Aborîyê Tê Hiştin

- Divê pêşî lê bê girtin ku şaredarîya bi pêkanînên qeyûm bi temamî bê erk hatîye hiştin û bûye parçeyeke rêveberîya navendî, li derî qada civakî, sîyasî û aborî bê hiştin,
- Li bajêr gelek pêkanîn ji alîyê şaredarîyê ve tên kirin, “bajarê bê şaredarî êtîm e” û ji hêzeke mezin bêpar e, divê ev hêz mudaxilî aborîyê bê kirin,
- Wekî Şaredarîya Bajarê Mezin a Stenbolê û Îzmîrê, divê kargehên aborî bên çêkirin û divê ev avahîyên erdhejê çêbikin, bi kirîna berheman piştgirîyê bidin kooperatîfan û ji bo pêşxistina kooperatîfên jinan tevkarîyê bikin,
- Divê şaredarî divê di warê aborî de bi bajêr re bibin yek û di vî warî de bixebitin,
- Divê şaredarî karên aborî bikin û ger hewce bike di ser kargehan re bixebitin.

DI ÇARESERKIRINA PIRSGIRÊKÊN BAJÊR DE ŞAREDARÎ Û POLÎTÎKA

Sedat Yûrtdaş – Cîgirê Serokatîya DÎTAM’ê (Moderator)

Me hemûyan di vê raporê de dît ku heyama 8 salan a qeyûm bê bûye sedema texrîbatên çi qas mezin. Hin şaredarî ji sedî 92'yê budçeyê ji bo lêçûnên personelan xerc kirine, wesayît hatine hîbekirin, şaredarî hatine asta xitimandinê û gelek mal û milk wekî bên talankirin tehsîsî hin sazîyên din hatine kirin û belavkirin. Me ev, di serdana xwe ya hevşaredaran de bi hurgulî dît. Lewma pir eşkere ye ku ji bo çareserkirina vê meseleyê xebateke pir cidî divê. Ji bo axaftina di vî warî de ez mafê axaftinê didim Hevşaredara Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê Serra Bucak.

Serra Bûcak – Hevşaredara Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê

Beşdarên hêja, serokên sazîyên civaka sivîl ên hêja, hevserokên şaredarîyên me yên hêja, endamên meclîsên sazîyên civaka sivîl, jinên hêja... Ez we hemûyan bi rêz û hezkirin silav dikim. Em kêfxweş in ku îro li vir hatine vexwendin. Ev, bi rastî jî destpêşxerîyeke hêja û girîng e. Em spasîya xwe ji DÎTAM'ê, endamên rêveberîya wê, serokên hêja û hemî çalakvanên ku beşdarî hewldanên civaka sivîl dibin re pêşkêş dikin.

Civînên nivendi ku awayê wê yê raporkirî ji me re hatin ragihandin, bi heyana hilbijartinê re hevdem bûn. Ji van civînan pêşnîyazên hêja hatin derxistin. Wekî ku em ji rapora kurt û pêşkêşkirinê tê derdixin, em bi pênc salên dijwar re rû bi rû ne - pênc sal ku em dixwazin mayînde bin, wekî dayikên me dibêjin. Em bi wêranîyeke mezin re rû bi rû ne ji ber ku rêveberîyên herêmî hatine têkbirin, sekte li wan hatîye xistin û hatine texrîbkirin û heşt sal in ku xizmetên herêmî nehatine bicîhanîn.

Di pênc salên bê de û piştre jî, em ê van civînan bikin beşeke birêkûpêk ji karê xwe. Ji ber ku mekanîzmaya herî mezin û hêja ku dê me xurt bike, me bike enîyeke yekgirtî û me motîve bike û rêberîya me bike ku em bi hev re tiştan bikin - ne tenê ji bo nîqaşê, lê ji bo çalakîya kolektîf - dê ji van civînan derkeve holê. Hin ji hevkarên me di komên mezintir de dicivin, hinên din jî di komên piçûktir de dicivin. Bi vî rengî, em xwe pir bi hêz hîs dikin.

Ez dixwazim ji cîhekî hinekî xemgîn, lê hinekî jî jidil biaxivim. Amed di xizmetên herêmî de çi winda dike? Bi rastî, meseleya sereke, bi awayekî, ev e: *"Çima bi xelkê herêmî didin windakirin?"*

Mercê herî girîng ji bo bidestxistina xebata hevkar a domdar ew e ku em xwezaya xwe ya rastîn wekî civak, hewldanên civaka me yên heta niha û hemî hêvîyên wê eşkere bikin. Ev ne hewldaneke hêsan e, ne jî avahîyeke civakî ye ku ji xweber derketîye holê. Em, civaka Kurd û hemû bajarên vê herêmê aîdî partîyekê ne ku ji sala 2000'î vir ve pratîkeke rêveberîya herêmî heye. Partîyeke sîyasî heye ku bi fêde û kêmasîyên xwe, şikil dide paradîgmaya rêveberîya demokratîk. Bê guman, em îro li vir necivîyane ku li ser partîyên sîyasî nîqaşê bikin, lê pratîkên pir girîng û kevneşopîyek û pratîkek heye ku partîyên sîyasî yên vê herêmê ji bo xurtkirina mekanîzma û dînamîkên herêmî danîne holê.

Ev pratîk aîdî partîya civaka me bi xwe ye. Em nikarin vê yekê ji partîya desthilatdar an jî ji muxalefeta sereke hêvî bikin. Ji ber ku ev welat xwedî felsefeyeke damezrîner, kodeke damezrîner e: Ev pergaleke navendî ye û nêrînek e ku dixwaze herêman ji Enqereyê bi rê ve bibe. Em pir baş bi bîr tînin ku me ji salên 2000'î û vir ve, bi Partîya Civaka Demokratîk re, aqilê sîyasî, civakî û kolektîf ji bo dijberîya vê nêrînê bi kar anîye. Li korîdorên Enqereyê, me broşureke bi sernavê "Çima Divê Tirkîye ji hêla Pergaleke Navendî ve Neyê Birêvebirin?" li hemû komên partîyên sîyasî belav kiribû. Di pirtûkçeyê de pirsên girîng ji bo çareserkirinê hebûn, wekî mînak ji bo Tirkîye demokratîk bibe û bibe welatekî hîn bêtir rêzê li mafên mirovan bigire û rêzê li hiqûqa gerdûnî bigire, çima divê ji Enqereyê neyê birêvebirin, çima pêdivî bi hikûmetên herêmî heye. Sal 2007 û hevkarên me karîn vê pirtûkê li holên Meclisa Mezin a Neteweyî ya Tirkîyeyê belav bikin û li ser biaxivin. Ji ber vê yekê, îro em paş ve hatine birin. Çima em paşve çûn û em çawa dikarin vê paşveçûnê rawestînin?

Tiştên ku me bi saya vê paşveçûnê winda kirine, me hemûyan pir aciz dikin. Ji ber vê yekê, pir girîng e ku em li ser pirsa balkêş a ku di sernavê raporê de hatîye raberkirin nîqaş bikin. Em bawer dikin ku divê em bi baldarî, cidîyet û fedakarîyeke mezin nêzîkî her mijarekê bibin ku di pêşkêşîya we de hatîye raberkirin. Gelek pirsgirêkên têkildarî bajêr hene ku divê neyên paşxistin, gelek pirgsirêkên ku rasterast me eleqedar dikin hene.

Em sê meh û nîv in ku hatine hilbijartin û ji wê demê ve, me gelek civînên civaka sivîl û komên fokusê li dar xistine. Wekî beşeke ji plana me ya stratejîk, em ji bo komên fokusê yên bi navê *"Amed pênc salên*

xwe yên bê plan dike” li hev civîyan. Me li ser bajar, jîngeh, veguhastin, jîyana civakî, jin, ciwan, zarok, astengdarî, avahîyên qaçax, pirsgirêkên binesazîyê, veguhastina nava bajar, bajarên biaqil, avahîyên civakî, avahîyên metrûk, erdhej, karesat, têkoşîna li dijî tiryakê û heta refujên navîn nîqaş kirin ku hemû di pêşkêşîya berê de hatine destnîşan kirin. Me li bersivên tişta ku divê em li dijî vê feraseta heşt salî bikin gerîya ku vî bajarî wêran kirîye, binesazîya wê, sosyolojî, perwerde û tenduristîya wê paşguh kirîye û ji bo baştirkirina her tişta ku dikare ji bo wê were kirin tu gav nehatine avêtin. Kombûn û nîqaşkirin tiştekî baş e û gihîştina encamên hevpar jî pir biqîmet e, lê niha divê em vê yekê bixin pratîkê û dest bi kar bikin. Divê em gavên berbiçav biavêjin da ku bi awayekî baldartir li ser tiştên ku dikarin ji bo vî bajarî werin kirin bisekinin. Wekî rêveberîyên herêmî, em dixwazin rê li ber hevkarîyê bi rêxistinên ku pêşengîya vê xebatê dikin an jî bi awayên curbicur piştgirî didinê vekin.

Ev heşt sal in, dînamîkên sivîl ên bajêr di xalên werçerxê yên girîng de bi lez û bez li hev civîyane, gelek pirsgirêkên civakî yên wekî karesat, erdhej û pandemîyê çareser kirine. Wekî din, ew di pêkanîn û avakirina projeyên berbiçav de roleke girîng lîstine. Îro, em pir bihêztir in. Ev ji ber ku rêveberîyên herêmî ne tenê girîng in, lê di heman demê de hêsankar in ku rasterast bandorê li bajêr dikin. Ji ber vê yekê, divê em ji her demê bêtir girîngîya rêveberîyên herêmî biparêzin û girîngîya wan bixin rojeva xwe. Hewldanên plansazîya stratejîk ji bo pênc salên bê dê mezintir, domdartir û demdirêjtir bin. Her çend hin destpêşxerî dikarin di demeke pir kurt de werin pêkanîn jî, divê em yên din bi aqilmendîya hevpar û rêgezên tekûz di demeke navîn û demdirêj beralî bikin.

Di vê çarçoveyê de, ez dixwazim behsa hin xebatên me yên berbiçav bikim. Me mijareke girîng heye: têkoşîna li dijî tiryakê. Em di demeke kurt de li ser vê mijarê li hev civîyan û niha li qadeke guncaw digerin. Em dixwazin vê xebatê bi hevkarên xwe yên pispor re bidomînin. Lê mixabin, li şaredarîya me ji bo pêkanîna vê xebatê karmendên pêwîst tune ne. Qeyûman ne tenê bajar wêran kirin, lê di heman demê de çavkanîyên mirovî yên şaredarîya me jî kêm kirin. Her çend gelek projeyên me yên maqûl û li gorî hewcedarîyê hebin jî, avanîya karmendan a şaredarîyên me yên heyî jî bi heman rengî kêm in. Divê em vê rastîyê qebûl bikin û tekez bikin ku em ji bo vê pirsgirêkê jî li çareserîyan digerin.

Her wiha avakirina Daîreya Berastengan heê di beyannameya me ya hilbijartinê de hem jî di Beyannameya Bajêr de hebû. Yek ji pirsgirêkên demdirêj û çaresernekirî yên vî bajarî neavêtina gavek ji bo baştirkirina şert û mercên jîyanê yên fizîkî, aborî û civakî yên kesên astengdar e. Di vî warî de, em ê Amedê wekî bajarekî pîlot îlan bikin û Serokatîya Daîreya Berastengan ava bikin.

Qeyûman heşt sal in li bajarê me lûleyek avê çênekirine. Wan bi zanebûn hewl nedaye ku pirsgirêkên av, kanalîzasyon û binesazîyê yên bajêr çareser bikin. Wan bi zanebûnî hemû projeyên binesazîyê yên ku di sala 2016’an de ji bo îhaleyê hatibûn vekirin betal kirin. Yek ji mijarên ku di sê û nîv mehên dawî de herî zêde tê axaftin ev e: "Em çawa dikarin avê bi rê ve bibin, em çawa dikarin wê ji nifşên pêşerojê re bihêlin, em çawa dikarin wê domdar bikin?"

Bajar mezin bûye û îro nifûsa wê nêzîkî du milyon e. Mixabin, pêşveçûna bajêr di destê feraseteke tekparêz û rantxur de maye û ber bi alîyekî ku em naxwazin ve hatîye beralîkirin. Ev ne tenê zirarê dide mîmarî û tevna bajêr, lê di heman demê de gelek pirsgirêkan jî derdixe holê ku rêveberîyên herêmî nikarin çareser bikin; wekî av, gihanî û pirsgirêkên din ên bi vî rengî. Ji ber vê yekê, li cihekî ku van pirsgirêkan fam dike û fêm dike, em armanc dikin ku di pênc salên pêş de polîtîkayeke îmarê ya ku ji hêla hemû şaredarîyên navçeyên me û têgihîştina DEM Partîyê ve ya li ser rêveberîya herêmî ve hatî şekilkirin bicîh bînin. Ji bo vê armancê, hatina cem hev a bi odeyên pîşeyî, Odeya Mîmaran û gelek komên din re girîng e û em armanc dikin ku bi hev re bixebitin.

Sûr û Baxçeyên Hevselê hene, yên piştî sala 2015’an ji alîyê qeyûm û hikûmeta navendî ve hatin wêrankirin û niha li ber derxistina ji Lîsteya Mîrateya Cîhanê ne. Bi gelek hewildan û têkoşînê, me pêvajoyeke UNESCO’yê ku ji alîyê rêveberîyên berê ve di navbera salên 2014 û 2016’an de hatibû

destpêkirin, bi hewildanên hemû alîyên têkildar, di nav de şaredarî, rêveberîya qadê, hemû rêxistinên civaka sivîl ên li vî bajarî û hemû pisporên hêja yên ku di warê mîrateya çandî de dixebitin, pêk anî. Divê em hemû berpirsîyarîyê bigirin ser xwe da ku pêşî li wêrankirina bêtir a qadên me yên di Mîrateya Cîhanê de ne, bigirin.

Bê guman, yek ji projeyên me yên herî girîng di pênc salên pêş de dê vejandina Sûrê be. Em ê jîyanê li wir ji nû ve ava bikin, avahîyên tescîlkirî biparêzin û dagirrîyên li wir bi dawî bikin û di heman demê de Çemê Dîcleyê jî biparêzin. Pirsgirêka dagirîyan yek ji pirsgirêkên herî girîng ên bajêr e. Heta di salên me yên destpêkê de wekî rayedarên herêmî, dagirkirina rêyên peya û deverên derdora Sûrê hebûn. Ev çand li gelek deverên bajêr belav bûye û divê em li dijî wê bitêkoşin. Lêbelê, di deh salên dawî de, ev çanda dagirkirin û paşketinê bûye polîtîkayeke bi zanebûnî. Bila tevahîya bajêr bibe cihekî paşketinê, bila tevahîya bajêr were dagirkirin da ku dagirkirin û paşketinên qaşo serdestan veşartî bimînin. Bila ev bajar ewqas bi pirsgirêkan ve were dorpêçkirin ku gendelî, wêrankirin, hilweşîn, dagirkirin û rantxurî yên ku li jor tên kirin, veşartî bimînin. Mixabin, wan atmosfereke wisa afirandîye û îro bi awayekî mezin bandorê li me dike.

Sê meh û nîv in, em li ser her qadê bê westan dixebitin - li Rezan, Sakarya, Ofîs, Yenîşehîr, Sûr û Balikçilera gavên pir piçûk diavêjin, bi sebir bi her kesî re diaxivin, da ku wan piştrast bikin ku ev bajar ê me ye. Em hewl didin ku bibîr bînin ku kolan ên me ne û divê em wan biparêzin, lê mixabin, em rastî berxwedaneke mezin tên. Ev ji bo me hemûyan pirsgirêkek e. Em bi tevahî dizanin ku em nikarin vê pirsgirêkê bi tena serê xwe çareser bikin. Ev ne tiştek e ku ji hêla polîs an jî zabiteyan ve were çareserkirin, ev meseleyeke wêrekî û têkoşîna kolektîf e.

Pir caran behsa pêvajoya paqijkirina ber sûran hatîye kirin. Ev pêvajoyeke girîng e ku di dema xwe de tevkarîyên girîng kirîye û îro jî bi me re deng vedaye. Bê guman, em cesareta xwe ji vê yekê digirin. Lêbelê, bîst û pênc sal derbas bûn û di van bîst û pênc salan de, bajarê me bi tevn û dînamîkên xwe yên civakî veguherîye. Divê em bi hişmendîya vê rastîyê têbikoşin û qet ne bi tena serê xwe. Em hewceyê piştgirîya her kesî ne, nemaze ji bo ku ev bajar domdar be, jîyanbar, paqij û bê destwerdanên rêyan be. Hemû civaka sivîl, û her kesê ku dibêje, "Ez li vir im, ez dijîm û ez dixwazim tevakarîyê li vî bajarî bikim," pêdivîya me bi we heye. Em dizanin ku em tenê dikarin bi hevkarîyê, aqilmendîya hevpar û pêkanîn hevpar vê yekê bikin.

Par, me rastîya erdhejê dît. Heta berî erdhejê jî, pirsgirêkên hêwirgehê û avahîyan li gelek navçeyên me hebûn û piştî wê hîn bû mijareke bêtir lezgînî. Di civînên berê de, me nîqaş kir ka divê veguherîna li cihêcih çawa were kirin û me dizanibû ku li vî bajarî zêdehîya avahîyan heye. Deh heta yanzdeh sal derbas bûn û hîn jî li bajêr zêdehîya avahîyan heye. Lê ev avahî ji bo kê tên çêkirin? Ji bo rewşa kîjan mirovên sosyo-aborî tên çêkirin? Ji bo kê tên firotanê? Meseleya me hemû ev e. Hin cih ji bo îmarê tên vekirin, bajêr ber cihekî em naxwazin ve diçe û kirrûbirên wê xwedî statuyeke civakî û aborî ne. Dê çi bibe rewşa deverên mayî yên vî bajarî; Rezan, Şehîtlîk, Ben û Sen, Fîskaya û Huzurevlerî? Mînak, Rezan ji destpêka salên 2000'î vir ve hewceyê başkirin, îstîqrar û veguherîna cihêcih e. Bi wêrankirina heşt salan a qeyûman re, piştî pandemî û erdhejê, kirîzên aborî û civakî li ser hev çêbûn û krîzeke gelekî mezin derket holê.

Ji ber vê yekê, divê em ji bo pirsgirêka avahîyan a kesên xizan û yên nikarin kirêya xwe bidin, perspektîfeke nû pêş bixin. Du xeyalên me hene: Yek ji wan veguherîna li cihêcih e. Ji bo pêkanîna vê xeyalê, em hewceyê qadeke rezerv in ku bi kêmanî çar apartmanî, çar bolokî bin. Em ji niha ve ji bo vê yekê ketine nava lêgerîna li erseyekê û em dixwazin xanîyên civakî ava bikin. Xewna me ya duyemîn jî: Ma em dikarin li dever û taxên din xanîyên civakî ava bikin, bêyî koçberkirin? Ji bo em kesî nexin bin barekî aborî yê giran, nexin bin kredîyên ku nikarin bên dayîn, divê em bi yekîtîyên kooperatîfan mirovan bikin xwedîyê xanîyan, xanîyên baş. Ji bo vê jî divê em bi hev re berpirsîyarîyê hilgirin. Em

dikarin ji bo vê yekê li Amedê modelekê biafirînin û wê li her derê herêma xwe belav bikin. Em xwedî wê hêz û bawerîyê ne û ya herî girîng, ji her wextê bêtir pêdîvîya me bi vê heye.

Wêranîya ku me piştî erdhejê jîya hîn jî li bajêr xwed dide der û tu kes ji me nikare çavên xwe bigire. Em vê yekê eşkere dikin, em li vir îlan dikin, em vê bangê dikin. Madem em naxwazin çavên xwe bigirin, nexwe tenê ne bi rêveberîyên herêmîre, ji bo vê divê hemû dînamîkên bajêr, sermayedarên bajêr û odeyên pîşeyan, civaka sivîl, odeya mîmaran, TMMOB, rêxistinên hiqûqê û hemû kes bê cem heve û em vê pirgsirêkê bi hev re çareser bikin û ji bo vê nêrîneke nû deynin holê.

Gelek spas ji bo hûn beşdarî vê civînê bûn. Nîqaş û pêşnîyazên li vir ji bo plana me ya stratejîk pir biqîmet in. Tîma plansazîya stratejîk û serokên beşên me îro li vir rûniştine û nîşeyan digirin. Di sê meh û nîvan de, me di her civîna ku em beşdar bûne de bi yekîneyên îdarî û endamên meclisê yên têkildar re me nişane girtine. Em ji berpirsîyarîya xwe haydar in. Em dixwazin erkên xwe bi awayê çêtirîn û bi durustî pêk bînin. Em ji her demê bêtir hewceyê yekîtî, piştevanî û hevgirtinê ne.

Em careke din spasîya DÎTAMê dikin ku îro me li vir anî cem hev. Spas ji bo keda we.

Sedat Yûrtdaş – Cîgirê Serokatîya DÎTAM'ê (Moderator)

Em ji dil spasîyên xwe pêşkêşî Hevşaredar Serra Bûcakê dikin ji bo axaftina wê ya ji dil û can ku pêşnîyazên çareserîyê dan der. Eşkere ye ku demokrasîya li welatekî bi demokrasîya herêmî ve girêdayî ye. Bêyî demokrasîya herêmî, li wî welatî demokrasî tune ye.

Mafê gotinê yê wê ye birêz Dogan Hatûn.

Dogan Hatûn – Hevşaredarê Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê

Bi rêzdarî hemû hevalan silav dikim. Her wiha spasîya DÎTAM'ê dikim ku me ji bo vê civînê anîye cem hev. Her wiha em spasîya her kesê ku beşdarî vê projeya hêja bûne dikin.

Mehmet Aslan di pêşkêşîya xwe de behsa gelek pirsgirêkên bajêr kir. Şaredar Serra jî, rewşa me ya niha yek bi yek anî ziman. Em dikarin bi hev re, hemû pirsgirêkên bajêr çareser bikin. Em dikarin ne tenê bi şaredarîyê, lê di heman demê de bi hemû rêxistinên civaka sivîl ên li bajêr û gelê xwe re çareserîyan ji bo pirsgirêkên bajarê xwe pêş bixin. Amed, xwedîyê hêza çareserkirina van pirsgirêkan e û em tecrûbeya xwe ya çareserîyê hatine heta vir. Hêza jîyana bi hev re û çareserkirina pirsgirêkan bi hezaran salan di çanda vî bajarî de heye. Ev çand, rêya xwe di her şaneya laşê me de dîtîye. Di vî warî de, tişta herî girîng ku em dikarin bibêjin ev e ku em ji bo çareserkirina van pirsgirêkan bawerîya xwe bi xwe tînin.

Me jî, ji dema ku qeyûm tayînî şaredarîyan hatine kirin, pirsgirêkên bajêr ên ku di pêşkêşkirinê de hatine destnîşankirin şopandine, belge kirine û ji bo wan yek bi yek gotina xwe gotîye. Em bi salan e van civînan bi hev re li dar dixin; em pirsgirêkan dizanin. Em çareserîyan jî dizanin. Di heşt salên dawî de, bajêr zirareke girîng a aborî û psîkolojîk dîtîye. Di nav sazîyê de zirareke girîng çêbûye. Biryardarîya çareserkirina van pirsgirêkan dê vê zirarê jî sererast bike. Armanca me ne afirandina nêzîkatîyeke rêveberîyê ye ku balê dikişîne ser dayîna deynên ku ji hêla qeyûman ve ji şaredarîyê re hatine hiştin, çareserkirina pirsgirêkên bajêr e. Dema ku ev pirsgirêk werin çareserkirin, ew deyn jî dê bi demê re bihelin. Em ê bi Banka Îllerî, Bankeya Cîhanê û bankayên pêşvebirinê re têkilî daynin. Em ê ji bo alîkarîya şaredarîyan di çareserkirina pirsgirêkên xwe û pêkanîna projeyên xwe de serî li ajansên fînansmanê yên bîyanî bidin. Em ê ji sazîyên navneteweyî yên ku ji bo binesazîyê, kanalîzasyonê û ava vexwarinê

alîkarî didin, serî li wan bidin. Em xwedî kapasîteya vê yekê ne. Ma ji ber ku bi katîrilyonan şaredarîyê xistine bin deynan, em ê pirsgirêkên vî bajarî çareser nekin û xizmeta vî bajarî nekin?

Ji bo pergalên ava vexwarinê û kanalîzasyonê yên Erxenî û Farqînê, dibe ku Bankeya Geşepêdanê ya Japonyayê 72 milyon euro alîkarî bide. Ev alîkarî dikare bi rêya Banka Îllerê were. Banka Îllerê şert daye ku ev pere bi tenê ji bo wê projeyê were xerckirin. Ger Banka Îllerê vî pereyî desteser neke, em dikarin çavkanîyan bibînin da ku pirsgirêkên bajêr çareser bikin. Hêz û kapasîteya me heye ku em vê bikin.

Em ê ji bo deynên ku çêkirine û zirara ku dane berpirsîyarîyê bigirin û em ê her gav vê meseleyê bişopînin. Em ê nehêlin ku ew piştî talankirina xwe di zewq û sefayê de bijîn. Ma wan bi katrîlyonan pereyê ji bo xizmeta vî bajarî, tenê ji bo berjewendîyên xwe yên takekesî xerc bikin? Na, wê tiştekî wiha çênebe. Ev pere ji berîka xelkê Amed derketîye û divê ji bo xizmetkirina gel û bajarê Amedê were bikaranîn. Ev çavkanî ji bo kêf û segfaya qeyûm û yên li derdora wî nehatîye. Lêbelê, em bawer dikin ku edalet dê were pêkanîn û ew ê ji wna hesab bê pirsîn.

Em ji bo karesatan amade ne. Bi saya ezmûna ku ji rêxistinên civaka sivîl ên li bajêr piştî erdheja 6'ê Sibatê ji bo çareserkirina vê pirsgirêkê bi dest xistine, me Navenda Kordînasyona Karesatan (AKOM) di nav şaredarîyê de ava kir da ku ne tenê erdhejan lê di heman demê de karesatên din ên li bajêr jî, di nav de pandemî, lehî, erdhej û karesatên din, çareser bike. Me cihê AKOM'ê dîyar kirîye û hevkarên me projeya wê ya mîmarî amade dikin. Piştî ku temam bibe, em ê wê bi rêxistinên civaka sivîl re parve bikin. Me li ser vê mijarê bi AFAD'ê (Serokatîya Rêveberîya Karesat û Awarte) re şêwir kirîye. Piştî ku temam bibe, em ê projeyê îhaleyê bikin û ji raya giştî re eşkere bikin. Em plan dikin ku li Amedê tesîseke mezintir ji bo hem perwerde û hem jî lojîstîkê, di nav de dezgeha agirkujîyê jî, ava bikin. Li bajarên cîran ên kurd gelek rêxistin hene ku çavkanîyên baş ji bo karesatan tune ne û em ê bi wan re bi hevrêzî bixebitin.

Ez dixwazim li ser mijara zimanê dayikê ku me di dema kampanyaya hilbijartinê de gelek caran anî ziman bisekinim û ez dixwazim li ser zimanê vî bajarî biaxivim. Heta ku Kurdî di nav dikandaran de, li sûkê neyê axaftin û heta ku Kurdî nebe zimanê perwerdehîyê, bandora asîmîlasyonê bê guman dê zêde bibe. Em nîqaş dikin ka em dikarin çi tevdîran bigirin da ku piştrast bikin ku Kurdî bibe zimanê fermî û asîmîlasyon destkeftîyên me yên zimanê dayikê paşde nexe. Me di nav şaredarîyê de dest pê kir û navên hemû yekîne û rêveberîyan bi awayekî duzimanî nivîsandine. Em ê bi rêxistinên civaka sivîl ên ku di warê ziman de dixebitin şêwir bikin û termên ku di xebata xwe de bikar tînîn bi rengekî guncaw biguherînin û wan di xebata xwe de bikar bînin. Ez bawer dikim ku eger zimanê Amed biguhere ji bo zimanê Kurdî, zimanê bajarên din ên Kurd jî dê hêdî hêdî biguhere ji bo zimanê Kurdî. Asîmîlasyona herî mezin li vî bajarî çêdibe; ji ber vê yekê, divê em berteka herî girîng li vî bajarî pêş bixin. Em ê amadekarîyên xwe û xebata ku me li ser vê mijarê kirîye hêdî hêdî bi hemû rêxistinên civaka sivîl ên li bajêr re parve bikin. Em ê bi hev re rexne li kêmasîyên ku me bigirin. Em ê bi hev re pêşînîyên xwe di van waran de çareser bikin. Em ji bo pêşdibistanên mîna Zarokistan û ZimZim amadekarîyan dikin. Ji bilî pirsgirêkekê, em ê van pêşdibistanan di Îlonê de, dema ku sala akademîk dest pê dike, li du yan sê cihan vekin.

Forûma Avê ya Mezopotamyayê di sala 2019'an de li Silêmanîyê der barê rewşa Çemê Dîcleyê de hatıbü lidarxistin. Hemû pirsgirêkên ku bajar, bajarok û welatên ku Dîcle di nav wan re derbas dibe, tevî kesên ku ji Çemê Dîcleyê yê 1900 kîlometreyî sûd werdigirin, çi zirar dîtîye û bi çi pirgsirêkan re rû bi rû mane, di vê forûmê de bi berfirehî hatin nîqaşkirin. Ez beşdarî vê forûmê bûm. Me lêkolîneke berfireh li ser ka Amed ji Çemê Dîcleyê çawa sûd werdigire, ji cihê Bendava Dîcleyê heta sînorê Batmanê û ji wir heta Cîzirö û Rojavayê kir. Îro, nivîna çem, ku bi qasî 60 kîlometreyan ji bendava Çemê Dîcleyê heta pira Bismilê dirêj dibe, bê statu ye. Ev beş bê statu ye; ew ne çem e jî; ew wekî bêserûber tê hesibandin. Li çaralîyê cîhanê mînakên vê rewşê hene. Afrîka jî xwedî çemeke bê statu ye. Gelên ku li kêleka çem dijîn,

bi têkoşîneke bihêz, di nav xwe de biryar dan ku çawa nasnameyeke mirovan heye, divê nasnameyeke çem jî hebe û wan nasnameyek dan çem. Çem, mîna mirovekî/ê, hewceyê nasnameyekê ye. Ji ber ku dewlet statuya çem nade, em ê bi dayîna statuyekê wê biparêzin.

Di vî warî de, qada Peyzaja Çandî ya UNESCO'yê ji bo me fersendeke mezin temsîl dike. Divê em bi hevkarîya sazîyên cemawerîyê yên heyî mîrateya xwe ya parastî ji nû ve binirxînin. Ev pirsgirêk nikare tenê ji hêla şaredarîyê ve, ne tenê ji hêla sazîyên civaka sivîl ve û ne tenê ji hêla Amedê ve were çareserkirin. Ev pirsgirêk dîplomasîyeke girîng hewce dike. Divê komîsyonek were damezrandin da ku bi hemû alîyên peywendîdar, partîyên sîyasî û rayedaran re nîqaş bike. Heta ku çem bêstatu bimîne, her gav çalên qûmê dê hebin. Heta ku çem bê statu bimîne, sîyasetmedar dê karibin di nav qada Peyzaja Çandî ya UNESCO'yê de ji bo xwe projeyan pêşve bibin û her cure derfetên rantê di nivîna çem de biafirînin. Nivîna çem, di rewşa xwe ya heyî de, bi gelek xetereyan re rû bi rû ye.

Hişmendîya talanker li van deveran, ez behsa her kesî nakim; di nav wan de mirovên rastgo hene ,ewqas hov e ku ew çaydanek ji bo pênc kesan difiroşin bi bihayên pir zêde, nêzîkî 2 hezar TL distînin. Ev rewş zirarê dide navûdengê bajarê me. Em bang li her kesî dikin ku di vê mijarê de piştgirîyê bidin. Em ji bo raya giştî, ji bo geştîyaran, ji bo nasnameya me ya bajarî û ji bo veguherandina wê ji bo cîhekî civakî, piştgirîya we dixwazin. Zabiteyên şaredarîyê bi tenê ji bo çareserkirina dagirkirin û talankirina li wir têrê nakin. Tenê bi hev re, bi hemû sazî û partîyên sîyasî yên bajêr re, em dikarin vê yekê çareser bikin. Divê em bêyî ku dagirker kî bin an jî kafeyên kê vekin, tevbigerin. Ev der neynik û rûyekî bajarê me ye, ji bo nasnameya wê cîhek girîng e. Em dixwazin ev pirsgirêk bi dîyalogê çareser bibe; em naxwazin tenê bi rêya zabiteyan li çareserîyekê bigerin. Ji ber vê yekê, em ji her kesî bi awayekî ferdî dipirsin: em amade ne; heke hûn piştrast bin, em dikarin ji bo wê herêmê çareserîyekê bibînin. Wekî bajar, em dikarin bi zimanekî hevpar, bi hev re xebitîn û bi hemû alîyan re axaftinê çareserîyekê pêş bixin. Ekskavator, buldozer û zabite tiştên herî hêsan in ku meriv bike; em ji bo dîyalogê parêzerîyê bikin. Bila gelê me vê yekê bizanibe û em ji wan alîkarîyê dixwazin. Çemê Dîcleyê yê me hemûyan e; ne yê wan kesan e ku li wir kargehan vedikin û wir dagir dikin. Em dixwazin ku xelkê Amedê bi awayekî dadperwer û azad jê sûd werbigirin.

Dixwazim tiştekî der barê veguherîna bajêr de bi bîr bînim. Zêdetirî du sal û nîv berê, ez hevberdevkê Yekîtîya Odeyên Endezyar û Mîmarên Tirk (TMMOB) bûm û Munîr Karaloglû wê demê walîyê Amedê bû. Wê demê, gelek xanî û kargehên neqanûnî li bajêr dihatin çêkirin. Wekî TMMOB, me ev avahîyên neqanûnî yek bi yek tespît kirin û ji bo ku em dîyar bikin ka neqanûnî ne, bi hemû şaredarîyan re têkilî danî. Şaredarîyan bersiv dan ku ev hemû avahî neqanûnî ne û ew ê tevdîrên pêwîst bigirin. Lêbelê, ew bi awayekî keyfî tevgerîyan û nekarîn pêşî li van avahîyên neqanûnî bigirin. Her wiha ji bo çareserkirina qadên bazirganî yên ku qezencên girîng bi dest dixisitin jî tiştek nekirin. Ji ber vê yekê me, wekî Ode, li dijî hemû qeyûman doz vekir. Me li ber Edlieyaya Amedê civîneke çapemenîyê li dar xist. Lêbelê, roja din, walîyê vî bajarî çû Ben û Sen, Fîskaya û dû re çû Peyasê. Wî avahîyên ku 40-50 sal berê li ser gel hatine çêkirin hilweşandin. Me ev jê re got: Te em şaş fêm kirine. Li ser rêya ku tu bikar tînî avahîyên neqanûnî hatine çêkirin. Çima tu vê yekê çareser nakî û malên mirovên belengaz ên ku 50 sal berê ji bo bi cih bibin ava kirine, hildiweşînî?

Îro, em berpirsîyarê vî bajarî ne û em dixwazin hûn bizanin ku em ê vê pirsgirêkê çareser bikin. Du roj berê, Wezîrê Jîngeh û Bajarsazîyê hat Amedê. Me xwest em bi wezîr re hevdîtinê bikin, lê wan pêwîst nedît ku me vexwînin. Cîgirê Wezîrê Karên Hundir Munîr Karaloglû heman tişta ku berê gotibû got: Em ê Fîskayayê hilweşînin, em ê Ben û Senê hilweşînin, em wir hilweşînin, em ê wir xera bikin. Bi hezaran avahî di erdhejê de zirar dîtin. Çima Rêveberê Jîngeh û Bajarsazîyê yên Midûrîyeta Bajêr van avahîyên ku bi giranî zirar dîtine hilneweşand û wan bi awayekî metruk hişt? Ger cihek wekî metruk were binavkirin, veguherîna bajar li wir tê destpêkirin. Ez dikarim vê yekê bibêjim ka çima avahîyên metruk nehatine hilweşandin? Wezareta Jîngeh û Bajarsazîyê li her derê polîtîkayên TOKÎ'yê dimeşîne. Ji ber

vê yekê, ew hewl didin ku van deverên qaşo yên ku umrê xwe temam kirine veguherînin navendên mezin ên rant û talanê. Ji bo berfirehkirina qadên rantê ew dixwazin gel ji qadên jîyanê derkevin. Lê wê gele wir çawa derkeve û wê biçe ku? Ew dixwazin çand û edetön civakî yên ku ji hêla mirovên li wir çêbûne bi koçberkirinê ji holê rakin. Ji bo vê armancê, ew bi wêrankirina van deveran bingeha vê hilweşandin û talankirinê datînin.

Em bang li Wezîrê Jîngeh û Bajarsazîyê dikin. Em li vî bajarî dijîn. Em hevşaredarên ku ji hêla gel ve hatine hilbijartin in. Ger hûn li vî bajarî projeyekê plan dikin, divê hûn me li ber çavan bigirin. Ji ber ku gelê vir me hilbijartîye, hûn nikarin me paşguh bikin. Em bi gel re hene. Divê em her tiştî bi hev re li ser projeyên ku hûn hewl didin li vî bajarî bicîh bînin nîqaş bikin, danûstandinan bikin û binirxînin. Em dixwazin Midûrîyeta Jîngeh û Bajarsazîyê ya Bajêr, Midûrîyeta Herêmî ya Weqfan û Midûrîyeta Herêmî ya Rêbejahîyê bi me re bixebitin. Em dixwazin Midûrîyeta Karên Avê ya Dewletê li ser ava vexwarinê ya bajêr bi me re hevkarîyê bike. Em dixwazin bi wan re bicivin da ku em piştrast bin ku bajarê me di çend salên pêş de bê av nemîne. Lê daxwazên me yên ji bo randevûyê jî nehatine bersivandin.

Qeyûmên ku tayînî vî bajarî hatine kirin, heşt salan ji kanalîzasyonê bigire heta ava vexwarinê tu xizmet pêşkêş nekirine. Wan yek xeta avê ya nû venekirîye û xetên girtî paqij nekirine. Di heşt salan de nifûsa bajêr ji 500 hezarî zêdetir zêde bûye û av êdî têrê nake. Plana Stratejîk a Serokkomarîyê divê ji bo Amedê budçeyek zêde veqetîne. Em tenê dikarin pirsgirêkên vî bajarî bi hev re, bi sazî û rêxistinên civaka sivîl û giştî yên bajêr çareser bikin; derfetên vê hene.

Em du meh in li ser plana stratejîk dixebitin. Me bi keyayên 17 navçeyan, sazîyan, ode û rêxistinên pîşeyî re civînên komên nîvendî li dar xistin. Ev civîna ku ji hêla DÎTAM'ê ve hatî lidarxistin, mînakeke baş a van hewldanan e. Werin em li ser pirsgirêk û meseleyên ku di qonaxa plansazîya stratejîk de nehatine bîra me nîqaşan bikin û bînin bîra xwe. Werin em vê bikin plana xwe ya pênc salan. Careke din, ez spasîya DÎTAM'ê û xebatkarên wê dikim.

PÊŞNÎYAZÊN PLANA STRATEJÎK JI BO KOMÊN BAJARÊ: TEVKARÎ Û PIRS

Sedat Yûrtdaş – Cîgirê Serokatîya DÎTAM'ê (Moderator)

Em ji dil spasîyên xwe pêşkêşî Hevşaredar Serra Bûcakê dikin ji bo axaftina wê ya ji dil û can ku pêşnîyazên çareserîyê dan der. Eşkere ye ku demokrasîya li welatekî bi demokrasîya herêmî ve girêdayî ye. Bêyî demokrasîya herêmî, li wî welatî demokrasî tune ye.

Mafê gotinê yê wê ye birêz Dogan Hatûn.

Mehmet Kaya - Serokê Odeya Bazirgaîn û Pîşesazîyê ya Amedê (DTSO)

Spas dikim. Birêz Serok Serra, bangek ji bo kardêran kir. Wekî nûnerên 23 hezar kardêran, divê em bersiv bidin. Ji 23 hezar endamên me nêzîkî 10 hezar jö di sektora înşaetê de çalak in. Şîrketên Amedê di sektora înşaetê ya Tirkîyeyê de projeyên girîng pêk tînin. Li gel van projeyên girîng, hema hema hemû veberhênerên Kurd dixwazin beşdarî projeyeke têkildarî Amed bibin.

Herêma Pîşesazîyê ya Organîzeyê ya Tekstîlê, Herêma 6'emîn daxilî teşwîqê ye. Lêbelê, hema hema 76 veberhênerên ku heta niha li Herêma Pîşesazîyê ya Organîzeyê yaTekstîlê veberhênan dikin ji Stenbol,

Enqere û Îzmîrê hatine. Lêbelê, dema ku em li rabirdûya van veberhêneran dinêrin, em dibînin ku wan ev herêm terikandine û çûne rojavayê Tirkîyeyê. Wan karsazîyên xwe li Stenbol û gelek deverên din ên cîhanê mezin kirine û ew cardin vedigerin herêmê da ku veberhênan bikin û mezinbûna xwe bidomînin. Alîyek wan a hestyarî heye.

Di sektora înşaetê de me pîvanek û hêvîyên pir mezin hene. Mîna Komeleya Muteahîdên Cemawerîyê û Karsazan (KAMÎAD), ew komeleyek e ku ji hêla muteahîdênjgelek bajarên Tirkîyeyê ve hatîye damezrandin. KAMÎAD rêxistina sîwanî ya gelek komeleyan e, di nav de Komeleya Muteahîdên Înşaetê ya Amedê (DÎMDER) jî heye. Cîgirê serokê KAMÎAD'ê ji Amedê ye.

Birêz Serok, em xwedî hêz in. Karsazên me jî xwedîderketina vê herêmê hîs dikin. Em amade ne. Wekî karsaz, em her gav beşdarî projeyên bi vî rengî dibin an jî piştgirîyê didin wan. Em bi tevahî piştgirîyê didin projeyên bi vî rengî. Û ev ne ji bo qezencê ye; berevajî vê, karsazên me vê yekê wekî erkekê ji bo axa ku ew mîrasê esas digirin dikin. Tekane tişta ku divê em bikin ev e ku perspektîfa xwe bi awayekî erênî pêşve bibin, bi gelê herêmê re destên xwe bidin hev û bi hev re li ser tiştên ku em dikarin li vir bi dest bixin nîqaş bikin.

Hûn ê pênc salan vî bajarî bi rê ve bibin. Şaredarîyên me dê herêma me bi tevahî bi rê ve bibin. Serokê Yekîtîya Şaredarîyên Herêma Başûrê Rojhilatê Anadolûyê (GABB) jî li vir e. Em dikarin bi van yekîneyan re rûnin, projeyan pêş bixin û bi hev re serkeftinê bi dest bixin.

Ez ê axaftina xwe bi du sê xalan biqedînim. Em, wekî Kurd, pir caran li herêmê civîn û nirxandinên asta makro dikin Ji ber ku gelek pirsgirêkên me hene, ev civîn hem dirêj in û hem jî mirovan pir diwestîmnin. Lê di dawîyê de, mixabin em jî hevoka "karwan li ser rê rêz bûye" bi kar tînin ku em pir caran rexne dikin. Lêbelê, jêhatîbûna me tune ku karwanê bixin ser rê. Ji ber vê yekê, li şûna ku em hêvî bikin ku van hemû pirsgirêkên wekî çîyayan di carekê de çareser bikin, divê em yek bi yek wan çareser bikin û bi demên sînorkirî pêşve biçin. Divê em bi hev re bixebitin da ku pirsgirêkek di salekê de, pirsgirêkek din di 100 rojan de û pirsgirêkek din di 500 rojan de çareser bikin.

Divê em avanîyekê biafirînin ku bi rastî wekî modelek ji bo aborîyê kar bike. Ji ber vê yekê, di hawirdorek ku tê de beşdarîya herêmî an aborî tune ye, hûn çi bikin bila bikin, şensê we tune ku çareserîyek bibînin. Pergala teşwîqê ya şeş-herêmî, ku îro hikûmet herî zêde pesnê wê dide û di sala 2012'an de hat destnîşan kirin, jixwe 12 salî ye. Ango, heke we li Amedê kargehek vekir, hûn dikarin 12 salan ji teşwîqên sûd wergirin. Ew teşwîq îsal bi dawî bûn.

Hejmarên 12 salan ên bernameya teşwîqê ya ku ji bo çareserkirina newekhevîyên pêşveçûna herêmî hatîye çêkirin, hatin ragihandin. Li ser pîvana diravî, herêmên yekem û duyem, ango Stenbol û Îzmîr, bi tevahî rêjeya teşwîqê ya %61 werdigirin. Lêbelê, rêjeya teşwîqê ya tîpîk ji bo herêmên 5 û 6 ji bo her herêmê %10 e. Tenê Stenbolê 4 trîlyon Lîreyên Tirkî wekî teşwîq wergirt. Ji alîyê din ve, Amed 470 milyar Lîreyên Tirkî wergirt. Ango, Stenbolê 10 qat ji rêjeya teşwîqê ya Amed werdigire.

Dema ku em li rêgez û rêziknameyan dinêrin, teşwîqa ku derdikeve holê piştgirîya Herêma 6'emîn dike. Lêbelê, heya ku pêdivîyên herêmê bi awayekî rast neyên destnîşankirin, şensê vê teşwîqê tune ku were bicîhanîn. Ji ber vê yekê, pêdivî ye ku were misogerkirin ku hewildanên herêmî û encamên wan ên hevpar ên potansîyel bi rêkûpêk werin bicîhanîn.

Yek ji mijarên herî zêde li ser nîqaş tê kirin, li cîhanê nifûsa NEET e, ku tê wateya "Ciwan Ne di Perwerdehîyê de ne jî di Kar de ne." Nifûsa Amedê hema hema sê qatê ya navînîya Tirkîyeyê ye. Alîyek din a balkêş ev e ku di dema xebata projeya me ya herêmî de, me kifş kir ku li Amedê, ne tenê xizan, lê di heman demê de zarokên malbatên dewlemend jî ne di perwerdehîyê de ne û ne jî di kar de ne. Ev alîyê herî xirab ê ne di perwerdehîyê de ne jî di kar de ye. Di vî warî de, em pir di ser navînîya Tirkîyeyê

re ne. Ev yek ji astengîyên herî girîng e ji bo veberhêner û veberhênanan ku dikarin ji nifşekî bo nifşekî din were veguhastin da ku domdarîya sermayeya me misoger bike.

Şaredarîya Bajarê Mezin di van mijaran de rêxistina sîwan e, rêxistina me ya sîwan e. Divê em pirsgirêkên bajêr bi civînên teng çareser bikin, bi baldarî cudahîyên xwe yên der barê pirsgirêk û çareserîyan de bi beşdarên peywendîdar re destnîşan bikin û rêwîtîya xwe bi leztirîn awayî dest pê bikin. Rêwîtîyeke dirêj li pêşîya me ye, lê divê em bi bawerî li hember astengîyên ku em di rê de rastî wan tên derbas bibin û encamên wê qebûl bikin.

Bêyî ku hûn îro kîjan parametreyê li ber çavan bigirin, ji qalîteya jîyana mirovan bigire heya pêşketina civakî-aborî, encamên li herêmê di 20 salên dawî de nîşaneyeke eşkere ye ku polîtîkayên ku heta niha hatine bicîhkirin têk çûne. Divê em tiştekî nû bêjin. Divê em rola xwe bilîzin da ku di wextê rast û li ser bingeha rast tiştên nû ava bikin.

Reha Rûhavîoglû – Navenda Xebatên Kurdî

Ez dixwazim spasîya DÎTAM'ê bikim ji bo ku ji Çileya 2024'an vir ve vî karî dike û ji bo ku derfet da me ku em bi muxatabên sereke re li ser vê mijarê nîqaş bikin. Ez dixwazim çend tiştên din li ser çarçoveya plana stratejîk bêjim, bêyî ku bikevim nav hûrgulîyan. Ji bo gelek şaredarîyên li Tirkîyeyê, ev plana stratejîk tenê formalîte ye, kopîkirin û pêvekirina planan e. Lêbelê, Amed xwedî taybetmendîyên xwe yên bêhempa ye. Planeke stratejîk divê pabendbûnek be û em li paytextekê dijîn. Bi planeke stratejîk, hûn bernameyeke hikûmetê amade dikin. Ji ber vê yekê, em dikarin fikarên xwe li vir dîyar bikin, em dikarin vê û wê bikin, lê bi kêmanî divê ew kesên ku ji bo karê sereke berpirsîyar in haydar bin ku ew karekî ewqas mezin dikin. Bê guman, ew haydar in.

Planên stratejîk ên şaredarîyê divê nîşan bidin ku armancên maqûl hatine danîn, bi berçavgirtina armanc û derfetên heyî. Gotina ku em ê di pênc salan de 300 Zarokistanan vekin ne armancek pir rastîn e. Xwezî em bikaribana 3 hezaran vekin. Lê ya herî girîng, divê ev plan bi tevahî were şopandin û çavkanî û şert û mercên ji rehikê sûdê digirin ên mekanîzmayê nîşan bide. Heta niha, em li Amedê li dora maseyê rûniştine û me li ser çanda hevpar û etîka hevpar nîqaş kirîye, lê ez nafikirim ku çanda xebata bi hev re xurt e. Ji bilî bandora têkder a serdema qeyûm a li ser me hemûyan, em nikarin bibêjin ku berî wê têkilîyên me yên hevkar pir baş bûn. Ji ber vê yekê, bi destnîşankirina berpirsîyarîya rast û dabeşkirina kar ji bo hevparîya di vê plana stratejîk de, em dikarin hem başbûneke xurttir û zûtir ji wêrankirina aborî ya ku em qala wê dikin misoger bikin û hem jî hevkarîyek watedartir bi civaka sivîl a bajêr re pêş bixin.

Ez dixwazim li vir mînakeke pir bebriçav bidim. Ger çavkanîyên şaredarîyê bi xwe rê bidin ku di nav salekê de du Zarokistanan veke, Odeya Bazirganî û Pîşesazîyê û Baroya Amedê li kêleka me ne. Çima em wan teşwîq nekin ku her yek ji wan yekê vekin? Çima ev hejmar nabe çar? Ev celeb belavkirina beşdaran û berpirsîyarîya hevbeş girîng e. Li Amedê sazî hene ku çavkanîyên wan hene ku vê yekê bikin. Piranîya sazîyên li ser vê maseyê nînin, lê sazîyên mezin hene ku budçeyên wan hene. Girîng e ku ev sazî bibin beşek ji hin berpirsîyarîyan.

Pêdivî ye ku em karibin kategorîyên sereke yên di plana stratejîk de û kategorîyên di bin wan de bişopînin. Ger ev civîn beşek ji bingeha Tora Çavdêrîya Xizmetên Herêmî be, gelo ev tor dê her şeş mehan carekê an salane were lidarxistin? Ew dikare neynikek li ber şaredarîyê bigire, van hemûyan çavdêrî bike. Ez behsa neynikek dostane û hevpar ji hundur ve dikim. Divê em karibin çavdêrîya cihê ku em bi vê armancê re radiwestin bikin: gelo em di 5%, 10%, an 50% de ne, da ku bibînin ka şaredarîya me armancên bidestxistinî danîne û ji bo bidestxistina wan dixebite. Wekî hevalbend, divê em tiştên ku hev du teşwîq dikin ku baştir bibin bikin. Ji hêla din ve, hin gavên pêşînî hene, pirsgirêkên ku girîngîya

wan qet naguhere. Pêdivî ye ku ji bo vê hewldan, dem û çavkanîyön rast werin veqetandin. Ger hûn ji min bipirsin, wekî welatîyek, ez dixwazim ku em karibin hemû çavkanîyên xwe ji Zarokistanan re veqetînin. Lê gelo wiha ye, gengaz e? Na. Ji ber vê yekê, bêyî ku em pirsgirêkên her tim girîng ên bajêr ên wekî av, paqijî û binesazîyê paşguh bikin, divê em mijara zimanê dayikê û tiryakê bidin pêşîyê.

Em li ser îstihdamkirina bajêr diaxivin û Odeya Bazirganî û Pîşesazîyê dibêje ku ew amade ne. Ji ber vê yekê, heke em piştî sê salan di vê astê de bin, divê mafê wan hebe ku bipirsin çima ev yek çênebûye. Li ser pîvaneke makro, planê destnîşan dikin ka dê çawa û bi kê re hevkarî werin kirin, kî dê berpirsîyarê vê hevkarîyê hilgire û ev hevkarî dê pêvajoyeke çawa bişopîne. Di wê rewşê de, Mehmet Kaya dikare bibêje, "Ez ê mehê carekê bi şaredar re bicivim," û "Ez ê sê mehan carekê an heftane bi burokratê di bin banê şaredar de, cîgirê sekreterê giştî re bicivim." Bi vî rengî, pêvajo dê pêşve biçe û têkilîyeke watedar a hevkarîyê were çêkirin.

Berpirsîyarîyeke bingehîn a şaredarîyan ew e ku piştrast bikin ku nîştecih ji jîyana xwe ya li vî bajarî razî ne. Mixabin, tu yek ji bajarên me yên Kurd bi qasî navînîya Tirkîyeyê ji jîyana xwe razî nîne, ne em ji jîyana li bajarê xwe razî ne, ne jî em ji jîyana li Tirkîyeyê razî ne. Ma Kurdekî ku koçî Îzmîrê kirîye ji jîyana li wir razî ye? Ji ber vê yekê, em li vî bajarî hewceyê tiştekî ne ku me bextewar bike. Îro, nasnameya hevpar a Amedê me îdare dike. Li gorî lêkolînê, razîbûna ji jîyanê li Amedê 3.5 e, razîbûna ji jîyana li Tirkîyeyê 4 e, lê razîbûna ji Amedê dertê 7 e. Tenê teselîya welatîyên li vî bajarî ku çendî moralê wan xerab be û di karên giran de dixebitin jî, nasnameya Amedê û nasnameya hevpar a Aamedê ye. Divê em ji vê nasnameyê sûd wergirin da ku warên din ên jîyana xwe bigihînin astên baştir. Carinan, hûrgilîyeke berbiçav têgihîştinek li ser ka tevahîya mekanîzmayê çawa dixebite dide der.

Min berî hilbijartinê, dema ku me li ser mijara qanûna bajêr nîqaş dikir bi Şaredar Selçûk Mizrakli re, min tiştek gotibû. Min xanîyek kirî û min got ku enerjîya tavê tê de tune. Ev xanî sê sal berê hatîye çêkirin. Min ji muteahîd pirsî û wî got ku Dîyargaz destûrê nade. Min pirsî ku xwedîyê Dîyargazê kî ye. Min dizanibû ku Dîyargaz sazîyeke şaredarîyê ye. Di dawîyê de, Şaredar Selçûk bi hevkarên xwe re şêwirî û got ku muteahîd di vê mijarê de raya giştî dixapînin; di rastîyê de, şerteke wisa tune bû. Ji ber vê yekê min got, "Baş e, Şaredar Selçûk, wê hingê berpirsîyarîya te ev e: Divê tu di avahîyên nû de herî zêde bikaranîna enerjîya rojê ferz bikî." Ji ber vê yekê, heya ku hûn pergaleke rehikî ava nekin, sazkirina panelên tavê li ser avahîyê piştî ku ew bide pir biha ye. Bajar salê bi qasî 10 an 11 mehan tîrêjên rojê yên pir xurt distîne. Lê min nedîtîye ji bilî santralên enerjîya tavê (GES), ji vê yekê pir sûd hatibe giritn.

Em hemû ji wêranîyê haydar in. Her wiha em haydar in ku ev karekî pir pir dijwar e. Ez hêvî dikim ku em karibin vê pêvajoyê bi rengekî xweşik ji nû ve ava bikin û gava em piştî pênc salan rûnin, em ê bibêjin, "Erê, em pir kêfxweş in ku me vê tevkarîyê pênc salan domand.”

Doç. Dr. Vahap Coşkûn – Hîndekarê Fakulteya Hiqûqê ya Zanîngeha Dîcleyê

Ez dixwazim pêşnîyazên xwe xal bi xal û bi aweyekî pir kurt pêşkêş bikim:

1- Hêvîya me ya herî bingehîn ji şaredarîyê, berî her tiştî, ew e ku ew xizmetên bingehîn ên şaredarîyê pêşkêş bike. Ev tê wateya berhevkirina çopê, paqijkirina kolanan û dabînkirina xizmetên gihanîyê yên bingehîn. Divê ev xizmetên bingehîn berî ku her projeyên din ên mezin werin bicîhanîn an piştgirî wergirin bên pêkanîn. Li vir standardek hatîye danîn. Her pêkanînek ku dikeve bin vê standardê, rewatîya şaredarîyê û piştgirîya wê ji holê radike. Ji ber vê yekê, divê şaredarî hewleke hevgirtî bide da ku van xizmetên bingehîn dabîn bike.

2- Di pênc salên bê de, divê şaredarî xizmetên şaredarîyê yên civakî bide pêşîyê. Ev hem ji hêla exlaqî ve û hem jî ji hêla sîyasî ve rast e. Ji hêla exlaqî ve, ji ber ku, di demekê de ku civak krîzeke aborî dijî, berpirsîyarîya exlaqî ya şaredarîyê ye ku xwe bigihîne kesên herî şikestî. Her wiha ji hêla sîyasî ve jî rast e ji ber ku kirina vê yekê dê bihêle hûn bigihîjin girseya li derî girseya we. Yek ji sedemên sereke ku Şaredarîya Bajarê Mezin a Enqere û Şaredarîya Bajarê Mezin a Stenbolê di van hilbijartinan de bi rêjeyeke ewqas mezin bi ser ketin, ji ber van pêkanaînên şaredarîya civakî bû.

3- Di raya giştî de behsa hin projeyan tê kirin; ev "projeyên balkêş" in, mîna pergala rêhesinê. Ez pisporekî teknîkî nînim û nizanim ev proje dikarin heta çi radeyê werin pêkanîn. Lêbelê, ramanên ku min ji hin pisporan wergirtine ku ez li ser vê mijarê bawerîya xwe bi wan tînim, nîşan didin ku pergala rêhesinê ji bo Amedê ne projeyek erênî ye ku tê pesinandin. Ji ber vê yekê, baş e ku meriv di vê mijarê de lez neke û piştî şêwirîna bi pisporên pêwîst biryarekê bide.

4- Amed xwedî nifûseke ciwan e. Piranîya zarokên me xwe ji bo azmûnên zanîngehê amade dikin. Pirtûkxane û dersxane pêdivîyek mezin in. Şaredarî hewce ne ku di vî warî de hewldaneke cidî bidin û piştgirîyê bidin dersxane û pirtûkxaneyên ku hîn vekirî ne. Mînak, dê sûdmend be ku xizmetên çay û qehweyê bidin xwendekarên ku serdana pirtûkxaneyan dikin. Her wiha dê pir sûdmend be ku odeyên xwendinê û dersxaneyên li parkan werin vekirin. Pirtûkxane heta nîvê şevê tijî ne û zarok li wir dixebitin. Ji ber vê yekê, divê şaredarî ji van pirtûkxaneyan re xizmetê dabîn bike. Di heman demê de, divê şaredarî ji bo zarokên malbatên dezavantaj piştgirîyê dabîn bike ku ji bo ezmûnên xwe amade bikin. Ev piştgirî divê ne tenê bi demên ezmûnan ve sînordar be; divê di tevahîya salê de were kirin.

5- Pirsgirêkên Amedê giran in û ne ji wan pirsgirêkan in ku Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê bi tena serê xwe dikare çareser bike. Ji ber vê yekê, dîyalog bi hikûmeta navendî re bi awayekî pêwîst e. Rast e ku hikûmeta navendî dê nexwaze beşdarî vê yekê bibe, lê divê Şaredarîya Amedê bi berdewamî daxwaza dîyalogê bike, dîplomasîyê bike, projeyên xwe eşkere bike û van hewldanan bi kar bîne da ku zextê li hikûmeta navendî bike ku gav biavêje. Divê şaredarî di vî warî de pir daxwazkar be. Ger lîstikek were xirabkirin, divê ya wê xera dike qethîyen ne Şaredarîya Amedê be.

6- Park, bi taybetî di havînê de, ji bo bajarê Amedê çavkanîya jîyanê ne. Hûn serdana kîjan parkê bikin, kîjan taxê bikin jî, beşeke mezin ji malbatan heta saet 1 an 2'yê şev li wir dimînin. Ew di heman demê de ciheke civakî û kombûnê ne. Şaredarî divê vê yekê li ber çavan bigirin û bi taybetî di mehên havînê de ji bo parkan xizmeteke baş bikin. Paqijîya parkan, ewlehî û xemilandina wan divê neyê paşguhkirin, ji ber ku ev xizmet rasterast bandorê li ser gel dikin.

7- Yek ji hêvîyên herî bingehîn ji şaredarîyan şefafî ye. Di serdemeke ku çapemenîya girseyî ewqas bi bandor e de, şefafî di îhale û biryarên şaredarîyan de ne tenê rewatîya giştî ya şaredarîyan zêde dike, di heman demê de rewşa wan a hiqûqî jî xurt dike. Di vî warî de, divê şaredarî tvdîrên pêwîst bigirin û sererastkirinên pêwîst bikin.

8- Ev mijar gelek caran hatîye ziman û ji şaredarîyan hatîye xwestin ku bi civaka sivîl re bêtir têkilîyê deynin û bêtir civînan li dar bixin. Bi xwe, ez naxwazim hûn bêtir civînan li dar bixin, berevajî dixwazim hûn kêmtir civînan li dar bixin. Lidarxistina gelek civînan wê têgihîştinê diafirîne ku hûn hewl didin ku tiştan bi rêya dîplomasîya giştî bi rê ve bibin, ne ku berpirsîyarîyên xwe bicîh bînin. Bi kurtasî, dibe ku lidarxistina ewqas civînan ne tiştekî rast be. Dê pir sûdmendtir be ku hûn li qadê bin û dîtina pêkanînan biryaran wê rasttir be.

9- Tiştekî ku min xemgîn dike heye, hem di plana stratejîk a pêşkêşkirî de û hem jî di nerînên li vir hatine dîyarkirin de. Belê, şaredarî sazîyeke xwedî karbidestî ye, xwedîyê hin hêzên aborî û qanûnî ye. Lê şaredarî ne xwedayeke dinyayî ye. Em nikarin ji şaredarîyê hêvî bikin ku hemû pirsgirêkên me çareser bike. Em nikarin hemû hêvî û fikarên xwe yên der barê perwerde, tenduristî, çand û dabînkirina hemû

xizmetên binesazîyê de deynin ser milê şaredarîyê. Ji ber vê yekê, divê şaredarî di vî warî de pir baldartir be.

Şaredarî rêxistineke civaka sivîl nîn e. Wekî nûnerên rêxistinên civaka sivîl, berpirsîyarîyekê li ser milê me tune ye. Em dikarin her tiştîa em dixwazin ji we re bêjin. Sîyaset ne aktibîstbûyîn e. Hûn ew kes in ku dê bi vê raya giştî re rûbirû bibin û berpirsîyar werin girtin û raya giştî ji we hêvî dike ku hûn bi ser kevin. Gel bi bahozên ku hûn di rê de bi wan re rû bi rû dimînin eleqedar nabe. Ew eleqedar dibin ka hûn dikarin keştîyê bigihînin bendergehê yan na. Ji ber vê yekê, divê şaredarî pêşînîyên xwe bi zelalî dîyar bike û li gorî wê nexşerêyekê destnîşan bike.

10- Di dawîyê de, ez dixwazim tekez bikim ku pêwîst e ev zimanê mexdûrîyetê were terikandin. Em dikarin bi saetan dîmeneke neyînî xêz bikin û bibêjin, "Dewletê wiha kir, qeyûm wihab kir". Dibe ku piranîya van rast be. Lê ev rastî çi feydeya wê ji bo kê heye? Ev rastîyên bêkêr in û divê em bi qasî ku pêkan be ji wan dûr bisekinin.

Şîyar Bozhan - Serokê Odeya Muşavîrên Darayî ya Amedê

Ez spasîya DÎTAM'ê û şaredarên me dikim ji bo ku piştî demek ewqas dirêj derfet afirandin ku em pirsgirêkên sereke yên bajarê xwe bi awayekî berfireh nîqaş bikin. Ew ji bo hevkarîya xwe û ji bo guhdarîkirina fikarên me di vê pêvajoyê de di nav me de ne.

Ez difikirim ku pêdivîya me bi dirûşmeyekê heye. Ji bilî logoyê, pêdivîya me bi dirûlmeyekê heye. Ev heşt sal in, ew bi dirûşmeyeke sar a wekî "Li Ser Serê Te, Li Ser Çavên Te" bajêr dan nasîn ku tu eleqeya wê bi bajêr re tune ye. Pêwîstîya me bi tiştekî li ser serê me an li ser çavên me nîne. Pêwîstîya me bi dirûşmeyekê heye ku dînamîkên vî bajarî, pêvajoya wî ya dîrokî, xwestek û armancên wî bîne ziman.

Wekî ku şaredara me Serrayê dîyar kir, em bi hêvîyeke pênc salî ya domdar dikevin vê pêvajoyê. Proje û armancên wê hatine plankirin ku bi demê re werin bicîhanîn. Bi hêvî me ku em ê bi tu qezayên trafîkê re rû bi rû neminin. Amed bajarekî kêmpeyda ye li cîhanê ku xwedî pêvajoyên dîrokî yên 10.000 an 12.000 salan e. Bajarên wisa xweşik hene ku dîroka wan a berê baş hatîye destnîşankirin. Dîroka wan 500 an 1.000 salî ye. Lê avahî û tevn di nav bajarekî bi dîrokeke 10.000 salî de pir girîng û watedar in. Divê em vî bajarî bi hêmanên wê yên bêhempa bixemilînin. Em dikarin bi tiştên biçûk dest pê bikin. Li şûna projeyên mezin, pêdivîya me bi projeyên biçûk heye. Gotinek bi Kurdî heye: "Yên ku neytawî ya lêdanê hebe, xwe dispêre kevirê biçûk. Yên ku neyta wan a lêdanê tune be, xwe dispêrin kevirê mezin." Ji ber vê yekê, em dikarin gav bi gav, bi projeyên biçûk dest pê bikin.

Tu karê me nakeve alîyê şaredarîyê. Ger karê we bi me re hebe, em dixwazin xizmet û alîkarîya we bikin. Ji ber ku em dixwazin vê pêvajoyê bi empatîyê ber bi pêş ve bibin. Berê, em di nav Konseya Bajêr de hevkar bûn. Lê îro, em di atmosfereke erênîtir de li kêleka hev radiwestin. Em dixwazin kêfxweşîya pêşveçûnê li kêleka hêzeke bihêz wekî şaredarîyê, bi çavkanîyên ku hene, biceribînin.

Pêşnîyazeke min ji bo vî bajarî heye. Pêwîstîya me bi tiştekî wekî doktora rûmetê, mufetîşê rûmetê û hwd. heye. Tu wateya wê tune ku em her tiştî ji navendekê bînin serkar û serokên daîreyan. Em dema ku li derve dijîn rastî pirsgirêkên vî bajarî tên. Trafîk, peya, kesên astengdar û dîwarên qirêj. Li Amedê qîrêjîya dîwaran û nivîsan heye. Dû re sembol hene, bo nimûne, sembol û tabelayên ku ne aîdî vî bajarî ne. Pêşî divê ev bên paqijkirin, paqijkirinek dîtbarî.

Rewşa xanîyên ku di erdhejê de wêran bûne bi rastî mijarek girîng e. Ez nizanim Wezareta Jîngeh û Bajarsazîyê, xwedîyên rastîn û xwedîyên destûrnameyên li deverên ku di vê erdhejê de wêran bûne û hatine valakirin çiqas di vê mijarê de beşdar in. Pisporên hiqûqê vê çêtir dizanin. Bi rastî, ev avahî ji ber

ku erd ne guncaw bû hatin hilweşandin. Bi taybetî beşa li Hatboyû, carekê rehek çem bû û ji ber vê yekê hilweşîn li wir diqewime. Her çend ev dever vala bin jî, divê mafên darayî yên xwedîyên rastîn werin parastin. Ger şaredarî karibin projeyên xanî yên mezin pêk bînin, divê ew wekî xwedîyên rastîn werin naskirin û erdên vala divê werin hêşînkirin. Daîreyên ku li ser van qadên hêşîn dê bibin çavkanîya neyta baş û qezencê ku bibe sedema zêdebûna bihayan. Daîreyên ku li ser van park û baxçeyan in dikarin bi rêya bacên milkê werin backirin û ji bo şaredarîyê fonek bê çêkirin.

Dema ku em diaxivin, divê em hem rexnegir û hem jî xwerexnegir bin. Ji bo paqijkirina avahîyên qirêj ên di nav û derdora sûrên bajêr de îradeyeke rastîn lazim bû û ev yek baş hat birêvebirin. Mixabin, li Çîyayê Kirklarê jî ezmûneke me ya avakirinê heye ku ev ji bo me xaleke referansê ya neyînî ye. Bê guman, heke em bi berdewamî bîranînên xwe bi berawirdkirina hêz û kêmasîyên xwe û lêkolîna tiştên ku me bi dest xistine, çi baş çi xirab, nû bikin, em ê di serdema pêş de çêtir pêş ve biçin.

Beşek jî heye ku bi hêşînkirina bajêr ve girêdayî ye. Ji bo rêxistinên civaka sivîl dê watedar be ku bibin beşeke ji pêvajoya hêşînkirin vî bajarî. Meseleyên vitîrînî yên biçûk girîng in. Li Enqereyê Parka Qazan heye. Ne du donim e jî, lê heye. Cihên piçûk û vîzyoner ên wekî van dikarin dîrokî, xwezayî, hêşîn bin, qaz hebin, an jî her tiştên li nav Amedê. Em dikarin bajêr bi tiştên biçûk ên wekî van xemilînin.

Nahît Eren - Serokê Baroya Amedê

Wekî serokê sazîya ku parêzerên vî bajarî girêdayî wê ne, wêrankirina heşt salan tiştek e ku em hemû bala xwe dikişînin ser, lê ez bawer dikim ku em hemû meseleyekê ji bîr dikin. Di hevdîtineke dawî de bi Şaredarê Peyasê re li ser tesîseke civakî, me ev tişt fêm kir: Şaredarîya Peyasê niha ji bilî çend avahîyên prefabrîkî û avahîya ku xizmetên îdarî yên şaredarîyê lê tên kirin, binesazîya xwe ya teknîkî tune ye. Şaredarîya Peyasê dê di pêşkêşkirina xwe ya îro de van xizmetan, ji pêşxistina çandî û hunerî bigire heya perwerdehîya bi zimanê dayikê yên zarokan û hewcedarîyên lênêrîna rojane, li ku û çawa çareser bike?

Em hînî qeyûman kirin, lê wekî civak, em li ser wêranîya ku wan li vî bajarî kirîye bêdeng mane. Dema ku hûn rayedarên hilbijartî li ser kar nehêlin, kesê ku ji hêla hikûmeta navendî ve hatî tayînkirin, avahîyên ku we bi salan e li herêmê ava kirine, bi fonên ji budceya navendî ji vî bajarî re hatine veqetandin û li gorî nasname, reng û şêwaza jîyana min, an jî çalakîyên şaredarîyê yên ku divê ji bo parastina wan werin kirin hatine şikilkirin, betal dike. Bîst û heşt avahîyên aîdî Şaredarîya Peyasê ji bo heyameke 25 salan ji Sazîya Goşt û Masîyan, Rêveberîya Karûbarên Olî û hemû sazîyên dîrokî re hatine dayîn, ku careke din neyên vegerandin. Ev avahîyên hatine dayîn dikarin bi şertê ku şûngirek guncaw were dîtin werin stendin.

Bi rastî, ev reftar li ber çavên me çêbûye. Em nizanin ka em hemû hatine tirsandin an jî hay ji zirarê tune ne. Em behsa rêveberîya herêmî dikin, behsa beşdarbûna di rêveberîyê de li ser bingeha îradeya gel dikin ne li ser bingeha hikûmeta navendî. Lê ev avahî ew in ku dê çanda me, zimanê me û nasnameya me ya bajarî hilweşînin û yên van li ser pêyan bihêlin jî ev in. Ev avahî hemû ketine destê hikûmeta navendî. Di destê Midûrîyeta Werzîşê ya Bajêr û hwd. de ne. Em ê çawa ji vir derkevin?

Qadên me nînin ku em hemû pirsgirêkên ku we behs kirine, tevî têkilîyên bi rêxistinên civaka sivîl û pîşeyî re, çareser bikin û hemû pêşnîyazên xwe bicîh bînin. Ji ber vê yekê, divê em, civaka sivîl, rêxistinên pîşeyî û şaredarî, ji bo têkoşîna li dijî vê talanê ku min destnîşan kirîye, demildest tevbigerib ku em çi bikin? Gelo divê em şandeyekê ji bo çareserkirina van pirsgirêkan ava bikin? Gelo divê Konseya

Bajêr ji bo van pirsgirêkan pratîkeke xebatê saz bike? Divê em hesab ji hikûmeta navendî bipirsin, ji ber qeyûmên ku ji bo bajêr hatine tayînkirin, niha tu avahîyek di destê şaredarîyê de tune ye. Divê em wan bistînin. Biryar hatin dayîn. Şaredar û encumenên hilbijartî tavilê van tehsîsan betal kirin. Lêbelê, sazîyên ku cih tehsîsî wan hatine kirin, serî li dadgehan dan. Van sazîyan bi awayekî rêxistinkirî û plankirî li dijî hemû biryaran doz li dadgeha îdarî vekirin û bi lez û bez li dadgehan biryarên rawestandina bicîhanîna biryarên meclisên şaredarîyan dan.

Divê em pêşî dengê xwe li dijî vê yekê bilind bikin. Avahîyên ku yên me ne û dê xizmetê ji bajar, ava re bikin û xizmeta zarokên vî bajarî bikin, divê em demildest wan bistînin. Eşkere ye ku dê bi têkoşîna hiqûqî tu encamekê bi dest nexin. Ma em ê vê yekê eşkere bikin? Ez nizanim em ê bi awayekî sîyasî an bi hikûmeta navendî re têkilî daynin. Lê bi raya min, ev yek ji fikarên me yên sereke ye niha. Ev mînakeke sereke ye ku vê wêrankirinê bi zelalî nîşan dide. Di vî warî de gelek karê me heye ku em bikin.

Sertaç Bûcak – Navenda Lêkolînên Sîyasî û Civakî ya Amedê (DİSA)

Pirsgirêka avê li Amedê hat rojevê. Ger şaş neyê bîra min, di dema Ferîdûn Çelîk de, pirsgirêka ava vexwarinê ya Amedê bi projeyeke ku ji hêla Wezareta Pêşvebirinê ya Almanyaya Federal ve hatibû piştgirîkirin û hate çareserkirin. Ger di pêşerojê de pirsgirêkeke wisa derkeve holê, dê sûdmend be ku em dîsa bi vê wezaretê re têkilîyê deynin. Bi rastî, wezîrê wê demê ji Partîya Civakî ya Xiristîyan bû ku partîyeke rastgir a tundrew e. Lê wî ji bo pêşketina vî welatî û ji bo van kesan piştgirîyeke girîng da vê projeyê. Wezîrê niha endamê Sosyal Demokratan e. Ez bawer dikim ku dê sûdmend be ku meriv li ser vê mijarê gav biavêje.

Ya duyemîn jî têkildarî teşwîqan e. Ji bo şaredarîyê zehmet e ku her tiştî bike. Ji ber vê yekê, heke em dixwazin ev teşwîq beşdarî xebata şaredarîyê bibin, divê Odeya Bazirganî û Pîşesazîyê ya Amedê roleke çalak bigire. Divê di vî warî de rê li ber şaredarîyan bixe, an jî divê bibe beşek ji vî karî.

Ya sêyemîn, ji bilî birina dadgehê, rêyeke din ji bo çareserkirina zirara ku ji ber meseleya qeyûm çêdibe tune. Ev mesele ewqas cidî ye ku dikare biçe Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê jî, lê em wisa nakin. Divê ev tişt bên kirin. Divê ev zirar her heyamê bê çareserkirin. Hevşaredarên Bajarê Mezin a Amedê %64 û AKP'ê jî %16 deng wergirtin. Lê dîsa jî wezîr tê herêmê û civînên koordînasyona bajêr li dar dixe. Şaredarê Rihayê diçe, lê li Amedê gazî şaredarê me nakin. Ez difikirim ku divê em li vir qîyametê rakin. Min ev nûçe li ser medyaya civakî di rojnameya Guneydogû Ekspresê de xwend. Girîng e ku ev pirsgirêk her tim bên bilêvêkirin.

Meseleya pêgirtîbûna tiryakê jî pir girîng e. Yekîtîya Ewropayê ji bo vê mijarê fonên darayî hene. Divê em li ser van fonan bixebitin. Li Almanyayê gelek Kurd di vî warî de dixebitin. Pêşnîyaz û piştgirîya wan jî dikare were xwestin. Dema ku min qedexeya geştê ya hevşaredarên Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê û hevşaredarên navçeyan dît, ez fikirîm ku ew naxwazin ev cure xebat çêbibin. Lê rêyên din jî dikarin werin dîtin.

Mehmet Demîr – Hevşaredarê Şaredarîya Batmanê yê Berê / Bijîşk

Planên stratejîk ên muazam ên şaredarîyên me hene. Lê ev plan tên têkbirin. Plana herî mezin ew e ku em pêşî li tayînkirina qeyûman li şaredarîyan bigirin. Berê, me karîbû nêzîkî 800 sazîyên civaka sivîl li Amedê bicivînin û bersiva xwe ya civakî pêş bixin. Pergala qeyûman ne tenê ji bo hevşaredaran an DEM Partî pirsgirêkek e. Ew, pirsgirêkeke civakî ye. Di vê rewşê de, divê her alîyê jîyana sîyasî û rêxistinên civaka sivîl vê bêtir bikin rojev. Lê rastîya Şaredarîya Colemêrgê heye. Divê em rastîya xwe ya civakî û

bersiva xwe ya civakî bi taybetî ji bo Colemêrgê pêş bixin. Divê em pêşî li tayinkirina qeyûman bigirin, ger em pêşî negirin dê hemû xebatên me pûç bibin.

Niha derfeta me heye ku em %80'yê daxwazên xwe ku di Qanûna Şaredarîya Bajarê Mezin a Hejmar 6360 de ku di sala 2012'an de hatîye derxistin, wekî xweserîya demokratîk hatine destnîşankirin, bi rêya şaredarîyên bajarên mezin pêk bînin. Ev ji bo wê yekê ye ku em deverên gundewarî bi deverên bajarî re entegre bikin û planên pêşketina gundan bi girîngî pêş ve bibin. Dibe ku em dikarin navendên perwerdehîya bajarên mezin li hin gundên navendî ava bikin û heke gengaz be, li hemû gundên xwe perwerdehîyê di warê çandinî, cotkarî û zimên de bidin. Ji ber ku ev paragrafek e ku li Qanûna Hejmar 5216 (Qanûna Şaredarîya Bajarê Mezin) hatîye zêdekirin. Ew berpirsîyarîyê dide şaredarîyên bajarên mezin ku piştgirîyê bidin hemû hewildanên çandinî û xwedîkirina heywanan.

Hikûmeta navendî hewl dide me ji civakê tecrîd bike. Lêbelê, divê em torên xwe yên civakî pêş bixin. Em dikarin xizmetên veterînerîyê yên mobîl ên standard dabin bikin, tenduristîya heywanan biparêzin û baştir bikin, hilberînê zêde bikin, di teknîkên çandinîyê yên nûjen de perwerdehîyê bidin û derfetan peyda bikin da ku berhemên xwe yên çandinîyê bînin bazarê. Em dikarin bi Şaredarîya Bajarê Mezin re hevkarîyê bikin da ku kooperatîfên sewalvanî û çandinîyê pêş bixin. Her çend sendîkayên avdanê di bin Wezareta Çandinî û Daristanan de ne jî, şaredarîyên bajarên mezin dikarin bi wan re hevkarîyê bikin. Em dikarin van pêş bixin û bi cidî li ser wan bixebitin. Em dikarin gihîştina hemû sebze, fêkî û nebatan ên endemîk ên Amedê bêtir berfireh bikin û projeyan pêş bixin da ku wan bi bandortir bi kar bînin.

Xalek din, li gorî ezmûna min a heta niha, ew e ku veguherînên bajarî yên bi mebesta bazirganî tên kirin, zeletîyekê li li ser xeletîyên din bar dikin. Her çend jîngeh dikare veguherîneke fizîkî derbas bike jî, ev veguherîn ji hêla aborî, civakî û jîngehî ve wêranker û zirardar in. Veguherîna bajarî dikare bi çavkanîyên bajarekî metropolîtan were bidestxistin, mînak, bi bandortirkirina MED AŞ.'yê ku karsazên Amedê jî bixwazin bibin şirîkê wê, mirov dikare bi rêbaza şirîkantîya MED AŞ'yê Rezanê di nava planeke stratejik a 10 salan de daxilî veguherîneke bajêr bike. Bi muteahîdan tu mecbûrî emsale zêde bikî. Tu wê çaxê derdorê texrîb dikî. Tu tesîsên civakî wêran dikî. Bê guman, ev veguherîn divê di serî de bi pêşengîya şaredarîyê were birêvebirin. Li vir jî, şaredarî xwedî pozîsyoneke xurt e. Bi rastî, Qanûna Hejmar 6360 ku di sala 2012'an de hatîye derxistin, her çend desthilatek zêdetir daye TOKÎ'yê jî, pozîsyona şaredarîyan di vî warî de xurt kirîye. Di her civakê de, pirsgirêkek dikare di kesekî an jî di herêmekê de derkeve holê.

Yek ji erkên herî girîng ên rêveberîyên herêmî afirandina derfetên îstihdamê ye. Ez dixwazim mînakek ji ezmûna xwe parve bikim. Di sala 2011'an de, em wekî nûnerên civaka sivîl çûn Polatlîyê. Me serdana Qeymeqamê Navçeya Polatlîyê kir. Bi gotinên wî, "Karker ji Başûrê Rojhilat tên vir. Em wan qebûl dikin ji ber ku kesek din tune ku karê wan bike. Lêbelê, em nahêlin ku ew bikevin bajaran. Em wan di kampan de digirin. Dema ku karê wan diqede, em ceryan û ava wan qut dikin û em nahêlin ku kes xanîyên xwe bi kirê bike da ku ew nemînin."

Afirandina derfetên îstihdamê berpirsîyarîya me ya sereke ye wekî rêveberîyên herêmî. Divê em karan biafirînin da ku rê li ber koçberîya mirovan a ber bi bajar û deverên din ve bigirin. Odeyên bazirganîyê bi xwezayî bi qasî şaredarîyan di pêşxistin û veguherandina bajaran, avakirina şêwaza jîyaneke rehet û afirandina derfetên kar de girîng û bibandor in. Ev yek hevkarîyek girîng hewce dike. Herêmên pîşesazîyê yên rêxistinkirî, nemaze yên ku li ser çandinî û xwedîkirina heywanan a pispor disekinin, ji bo me girîng in.

Ji alîyê bikaranîna çavkanîyên bi bandor ve, dahata mehane ya Şaredarîya Batmanê di navbera 15 û 19 milyon lîreyan de bû û tenê lêçûnên personelan 14.5 milyon lîre bûn. Lê me nekarî 10 milyon lîre ji tu bankekê, Banka Îller jî, bistînin. Şaredarîyên mezin bi qanûnî mafê şeş ji sedî ji dahatê hene. Divê

şaredarî di heman demê de beşdarî projeyên bazirganî jî bibin. Ger em beşdarî çalakîyên dahata bazirganî nebin û bi tenê girêdayî bankeyan û Banka Îllerê bimînin, em ê di bin kavilan de bimînin.

Ya duyemîn, şaredarî û rêveberîyên herêmî divê ne tenê xizmeta personelan, lê xizmeta bajêr jî bikin. Ger em li gorî daxwazên karmendên xwe tevbigerin, em nikarin çavkanîyên xwe bi bandor bikar bînin. Mînak, Şaredarîya Batmanê 50 otobus hebûn û rojane 21.000 rêwî hildigirtin. Tenê bi plansazîyek çal, me dikarîbû bi van heman otobusan kapasîteya rojane ya 45.000 rêwîyan bi dest bixista. Bê guman, em dikarin 8.000 lîreyan li ser sotemenîyê jî teserûf bikin. Divê em çavkanîyên xwe yên xwezayî bi bandor û bikêrhatî bikar bînin. Divê em bi kesên jêhatî re bixebitin.

Ez bawer dikim ku hevkarên me di hemû rêveberîyên herêmî de dikarin bi hevkarî û hevahengîya nêzîk bi beşdarên heyî re ji bin vî barî rabin.

Berîvan Gulşen Sîncar – Hevşaredara Şaredarîya Peyasê

Ez difikirim ku encamên vê raporê, nemaze civînên nîvendî yên ku hemû pirsgirêkên bajêr bi mehan berîya hilbijartinê destnîşan kirin, hem di wextê xwe de ne û hem jî balkêş in. Her du jî di tevahîya pêvajoyê de beşdarî xebata me bûn û bûn îlham ji me re. Partîya me di wê heyamê de civînên nîvendî û atolyeyên girîng jî li dar xistin. Bi rastî, bêyî ku em beşdarî gelek civîn û nîqaşên asta makro bibin, di dîyarkirina rewşê de tu kêmasîyên me tune ne. Em xwedî danhevî û asta polîtîk ya berfireh in. Lê ev yek divê bibe qonaxek ku pirsgirêkên ku em pê re rû bi rû dimînin çareser bike.

Bêguman em bi pêwîstîya pêşxistina bêtir a feraseta şaredarîvanîya civakî re hemfikir in. Hem wekî hevşaredara jin û hem jî wekî kesek ku bi salan e di vî warî de dixebite, alîyê herî girîng ji bo me ev e ku her beşek ji civakê ku îdîa dike ku pirsgirêkên xwe temsîl dike û çareserîyan diafirîne, çawa dikare bi rastî pirsgirêkên ku civak pê re rû bi rû dimîne hîs bike û çareserîyan pêş bixe.

Pirsgirêkên ku beşên xwedî dezavantaj ên bajêr pê re rû bi rû dimînin ku hem di daxuyanîya me de û hem jî di raporê de hatine behskirin, girîng in. Çima Amed di rêza bajarên herî bedbext de ewqas berbiçav bûye, wekî ku di çend salên borî de bûye? Em bi giranî li ser ka meriv çawa vê meylê berevajî bike disekinin. Divê ezmûnên bajarekî ku xwedî çandeke 12.000 salî, xwedî bîr û asteke polîtîk a berbiçav û di warê çareserkirina pirsgirêkên civaka sivîl û civakê de pêşketî ye, di 10 salên dawî de jîyaye, wekî pêvajoyekê bên dîtin.

Wekî rêveberîyên herêmî, çareserkirina tengasîya di xizmetguzarîyan de pirsgirêka me ya herî girîng e. Lêbelê, em dikarin beşên civakê yên hatine berberîkirin, dijber û nûner ên ku di nava hemû pirsgirêkên ku em îro bi wan re rû bi rû ne de ne wiha pênase bikin. Bi salan e, me mafê bajarvanîyê parastîye û piştrast kirîye ku her kesê ku li bajar dijî mafê wan ê gotinê heye di pirsgirêk û nexşerêya bajar de. Bi dehan rêxistinên civaka sivîl û kolektîfên hevgirtinê derketin holê. Lê ji nişkê ve, bi pêvajoya qeyûm re, bajar bi astengîyekê re rû bi rû ma ku di encamê de mafê gotinê di bajarvanîyê de ji holê rabû.

Ji perspektîfeke civakî ve, di şêwazên berê de guhertineke zêde çêbûye. Piştî civakeke dîsîplînkirî, civakeke performansê derketîye holê ku bi berdewamî çandeke xerîdaran derdixe pêş. Em bi taybetî di alîyê jinan de xebatên pir xurt dikin, mudaxileyî vê hat kirin û têra xwe hat pêşxistin. Lêbelê, îro, fikarên li ser kar, xizanî û koçberîya ber bi welatên din ve ji ber bêhêvîtîyê, pirsgirêkên herî girîng in. Zarok û ciwanên ji malbatên xizan an dewlemend ku ne di kar, hilberîn an perwerdehîyê de ne, ji bo herêma xwe bêhesas bûne. Dema wê ye ku em li ser vê yekê bisekinin ka çawa şêwaza gilî û gazinan ji bo vê zemînê çêdike.

Eger ciwanên ku di vê astê de ji jîyanê bêhêvî bûne hebin, divê em ji vê rastîyê jî dest pê bikin ku pêvajoya ku em dikarin bi rê ve bibin sînordartir e. Di vê heyamê de, şaredarî rastî herikîna serlêdanên ji ber xizanîyê tên, daxwaz û lêgerîna kar tê kirin. Em dixwazin bersiva her yekê bidin, lê rastî ev e ku em nikarin. Pirsek heye ku bajar, karsazên wê, pîşesazîya wê û hemû karsaz çawa dikarin di vî warî de piştgirîyê bidin. Her wiha pirsgirêk hene ku mijara lîyaqat û jêhatîbûnê çawa bûye sedema krîzekê.

Lêkolînek li ser ciwanên ku wekî Nifşa Z tên zanîn, eşkere kir ku ji sedî 67'ê wan bê pêşketinên teknolojîk in. Ev, tiştekî trajîk e. Berpirsîyarîya me ye ku em ciwanên ku li paş mane, nikarin xwe biguncînin daxwazên demê û bêhêvî mane, bi jîyanê ve ve girêbidin.

Esasê pêgirtîbûna tiryakê ew e ku li şûna ku em balê bikişînin ser rehabîlîtasyon û destpêşxerîyên bi vî rengî, divê em li ser sedema bingehîn a pirsgirêkê bisekinin, ne li ser encamê, wekî ku Kurd bi salan e dikin. Wekî rêveberîyên herêmî, gihîştina her ciwanekî û parastina mafê jîyanê yê her beşeke civakê ya bêparastin ji bo nêzîkatîya me bingehîn e. Derîyên me ji bo hemû avahî û yekîneyên ku raman, proje û beşdarîyên wan li ser vê mijarê hene vekirî ne.

Wêranîya ku ji alîyê qeyûman ve hatîye kirin, windahîyên darayî, desteserkirina milkên neguhêzbar û veguhestina wê ji bo sazîyên din, hemû vê yekê eşkere dikin. Bi rastî, ev wesfek e ku bajar nikare xwe bi rê ve bibe. Mekanîzmayek tê afirandin. Bi veberhênana bi sedan mîlyon dolaran di çavkanîyên sazîyên ku çavkanîyên wê bi xwe ne, mafên bajar tên desteserkirin. Niha, bi biryara tevdîrên teserûfê, ew dibêjin, "Hûn nikarin mîxekî jî bikutin, hûn nikarin xwe bi rê ve bibin. Ez çawa bixwazim ez ê wiha te bi rê ve bibim."

Li dijî vê rêveberî û dîskursê (bêjarê), bi dehan, heta bi sedan projeyên berbiçav hene ku dikarin ji hêla lihevkirina bajarî, konseya bajêr û rêxistinên konseya bajêr ve ji bo ciwan, jin, astengdar, xizan, kar û jêhatîbûnên pîşeyî werin pêşvexistin.

Her çiqas em deyndarê darayî bin jî, em mecbûr in ku çavkanîyan çêbikin. Her çiqas ew hemû çavkanîyên me bigirin jî, her çiqas ew derîyên me bigirin jî, em mecbûr in ku çareserîyan bibînin. Ji ber vê yekê, di her mijareke berbiçav de, her sazîyek li vî bajarî trawmaya herî mezin a civakî dijî. Pêdivî ye ku em ji vê trawmayê xilas bibin. Armanca dawîn dejenerebûn e. Nîşana herî mezin a sekinandina li dijî vê dejenerebûnê xurtkirina girêdana di navbera komên dezavantajkirî û jîyanê de ye û dihêle ku em ji bo deh salên pêş de plansazîyê bikin.

Dema ku em plana xwe ya stratejîk ji bo pênc salên bê çêdikin, em armanc dikin ku van hemû faktoran tê de bihewînin. Lêbelê, em qet naxwazin di vê yekê de bi tenê bimînin. Divê her sazî û pêkhateyek li bajêr xwe wekî mijara vê hewildanê bibîne. Divê em hemû beşdar bibin, berpirsîyarîyê bi hev re bigirin ser xwe. Em di nav mehek an du mehan de pêvajoya plansazîya xwe temam dikin. Lêbelê, pirsgirêk ne hewce ye ku plansazîya stratejîk be, lê belê vekirîtir, zelaltir û analîtîktir be ka em çawa dikarin gîyanê pênc salan yê Amedê ji nû ve vejînin û pirsgirêkên wê çareser bikin.

Remzî Azîzoglû – Serokê Komeleya Lêkolînên Ziman û Çanda Mezopotamyayê (MED-DER)

Em ji bo bilindkirina hişmendî û hişyarîyê li ser zimanê Kurdî dixebitin. Di axaftina vekirinê de hat gotin ku bajarên kurdan hatine paşguhkirin, paşde hatine xistin û her kes di vî warî de mutabiq e. Xwezî tenê paşguhkirina pirsgirêkên bajaran bûna. Wan her tiştî wêran kir. Wan zimanê me, hunera me, dîroka me, demografîya me, xwezaya me û yekîtîya me wêran kirin. Wan hemû sazîyên me hilweşandin, kapasîteya me ya rêveberîyê wêran kirin. Wan her tişta ku me heta niha bi dest xistibû betal kir. Ger em dixwazin ji bo pêşerojê bajarekî taybet biafirînin, divê em karakter û helwesta xwe ya berê ji nû ve saz bikin. Ji bo vê armancê, divê em di plana xwe ya stratejîk û planên din de ziman, çand û hunerê

bidin pêşîyê. Ev ê rê bide karakter û binesazîyeke bêhempa. Jixwe me Konseya Bajêr û rêveberîya bajêr ava kirîye. Bi rêya Konseya Bajêr, em ê li ser van mijaran bi hev re bixebitin. Ev ê ji bo vî bajarî çarçoveyeke hiqûqî biafirîne.

Yahya Oger – Serokê Komeleya Yeşîl Yildizê

Ez li ser navê komeleyê li vir im. Komeleyê li du bajaran nûnerên xwe hene, navenda wê li Amedê ye. Em ji sala 2013'an vir ve bi awayekî çalak li ser tiryakê dixebitin. Em beşdarî civînên berê yên DÎTAM'ê jî bûne. Berî ku têkoşîna li dijî tiryakê, ez ê çend pêşnîyazên dilnizm pêşkêş bikim. Her rêveberîya şaredarîyê rêveberîya berê bi hiştina xirbeyan tawanbar dike, an jî bi awayekî din, dibêje ku wan xirbe ji me re hiştine. Û di rêveberîya şaredarîyê de, zehmetîya ji nû ve avakirina ji xirbeyên serdema berê pir caran tê nîqaşkirin. Lê dîsa jî, ew kesên ku ji bo vê xebatê dilsoz in, rîska hilgirtina xirbeyan, avakirina ji xirbeyan û çandina gulan li ser kavilan girtine ber çav û û dane ser vê rêyê.

Pêşî, der barê Amedê de, di serî de Şaredara Şaredarîya Bajarê Mezin, xwezî çar şaredarîyên me yên navçeyên navendî, ji bo berterefkirina qirêjîya vî bajarî tevî hemû xebatakrana daketana qadan. Ev şaredar, serokên beşan û rêvebirên me yên rêzdar dihewîne. Mînak, li Şaredarîya Bajarê Mezin 2.000 xebatkar hene. Divîyabû wan devereke taybetî bi 1.000 kesan destnîşan bikirana û xebatek pêk bianîya, her çend bi awayekî sembolîk be jî, ji bo çareserkirina qirêjîyê. Amed bi rastî jî vê qirêjîyê heq nake. Ji bilî arterên me yên sereke, navenda bajêr bi rastî jî qirêj e.

Ya duyemîn, pirsgirêka dermanên kêzikan pirsgirêkek cidî ye. Em hîn jî wê dijîn. Ev ne tiştek e ku hikûmeta navendî bike; ev tiştek e ku divê şaredarî bi çavkanîyên xwe bikin.

Ya sêyemîn, ev bajar xwedî mîrateyeke dîrokî, çandî û olî ye. Riha cîranê wê ye. Navincî salane hejmara turîstên tên Rihayê nêzîkî 3 milyon e. Dahata turîstan ji bo Rihayê yek ji sektorên herî zêde mezin e. Lêbelê, dahata turîstan a ji bo Amedê negihîştîye 500.000 kesan. Ji ber vê yekê, ez bawer dikim ku yek ji avantajên wê yên herî mezin pêşxistina turîzmê, bawerîyên olî û turîzma bawerîyê ye ji bo afirandina çavkanîyên zêde û pêşxistina vî bajarî heta asteke bilindtir.

Em di warê veguhastinê de pirsgirêkên cidî dijîn. Li vir kartên kal û pîr û astengdaran ên tên paşguhkirin hene. Ev ne tenê pirsgirêka civaka Amedê ye; mirovên li hemû civakan bi awayekî kartên xwe yên astengdarîyê wergirtine. Lê em dizanin ku hîn jî gilîyên cidî tên kirin. Zabiteyên we dem bi dem vekolîn kirine. Lêbelê, li Amedê pirsgirêka me ya aîdîyetê heye. Mirov pirsgirêka aîdîyetê dijîn. Em bi civakeke sekuler û kapîtalîst re rû bi rû ne. Kapîtalîzmê rastbûna Amedê ji holê rakirîye. Wekî şaredarî, min dixwest ev bê kirin. Li şûna ku em bêjin, "Qeyûm ev kir," "Qeyûm ew kir," ez dixwazim ku hûn bêtir dem bidin pirsgirêkên qadên bi bawerîyên olî ve girêdayî, nemaze yên ku dikarin we û raya giştî bînin ber hev û manîpule bikin.

Ez ji sala 1986'an vir ve li Amedê me. Ez Dimilî me, ez Zaza me. Ez bi rûmet û serbilind im ku ez Zaza me. Me ev yek ji sala 1986'an vir ve li Amedê dîtîye. Hîn jî di tehamula me ya ji bo hev de sînor tune. Ez spasîya DÎTAM'ê dikim ku van civînan car bi car li dar dixe, yek ji wan civînên herî berfireh e ku mirovên ji komên cuda li dora heman maseyê tîne cem hev û tiştekî ku hesta aîdîyeta bajêr pêş dixe, bi dest dixe. Li vî bajarî em hewceyê aştî û aramîyê ne.

Birêz Serok, hevseroka min, eger em ê bi gefên bi keleş ên dagirkerên li dora Pira Deh Derî bitepisin, bi ya min em dest ji vî karî berdin.

Di warê têkoşîna li dijî tiryakê de, Amed piştî pandemîyê û erdhejê bi pirsgirêkên girîng ên têkildarî tiryakê re rû bi rû dimîne. Lêkolînek ku ji hêla Hevraya Amedê ve li ser nifûsa Amedê hatîye kirin nîşan

dide ku 75.000 kes pêgirtîyê tiryakê ne yan jî madeyên hişber bi kar tînin. TUÎK'ê (Sazîya Îstatîstîkê ya Tirkîyeyê) li ser vê mijarê li Tirkîyeyê tu lêkolînek nekirîye. Lêkolînên me yên qadê nîşan didin ku bi navînî di navbera %8 û %10'ê nifûsa Amedê tiryakê bi kar tîne. Di sala 2013'an de, nêzîkî 500 bikarhênerên jin ji bo dermankirinê serî li navendên tenduristîyê yên li Amedê dane. Ev cara yekem e ku hejmareke wisa li Amed tê tomarkirin. Ji ber vê yekê, divê di têkoşîna li dijî tiryak û bikaranîna madeyên hişber de gavên bilez werin avêtin. Dibe ku Hevra Amed (Navenda Piştgirî û Şêwirmendîya Hevra) were vejandin. Divê di navbera dînamîkên din ên bajêr de jî girêdanek were danîn.

Par, di sala 2023'yan de, du dozên ku zarokên di bin 12 salan de, hatin vekirin. Her wiha 27 dozên ku zarokên di bin 18 salî de ne û firoşkar jî tê de ne, li ber destê rayedarên dadwerî hene. Ji ber vê yekê, divê em tevdîrên cidî bigirin da ku pêşî li ber vê bigirin.

Pêşnîyazên min ji bo tiştên ku şaredarî dikare bike ev in. Pêdivî bi ji nû ve kifşkirina Amerîkayê tune. Komên li Amerîkayê hene ku bi alkol û narkotîkan re dixebitin. Divê karê van koman li ser xebatên qadî yên li Amedê were sepandin. Divê tîmeke seferber zû were avakirin û dakeve qadê. Divê em teqez wê têgihîştinê derbas bikin ku ez, wekî karmendekî/e sivîl, dikarim li ser kursîya xwe rûnim, bila pêgirtîyên tiryakê werin ba min û ez ê wan derman bikim.

Ne avahîyên metrûk e. Ew, warên pêgirtîyên tiryakê ne. Divê ev cih zû ji holê werin rakirin. Pirsgirêkeke din jî ev e ku pêgirtîyên tiryakê di avahîyên metruk an jî cîhên girtî de madeyan bi kar naynin; ew êdî di xanîyçn kire yên rojane de tiryakê bi kar tînin. Ji ber vê yekê, dovê avahîyên kire yên rojane jî werin kontrolkirin.

Ahmet Özmen – Yekemê Serokê DÎTAM / Parêzer

Di vê civînê de ev raman hatin pêşxistin. Ya yekem, ji ber ku mixabin dewlet û sazîyên wê, bi zanîna extîyaran, li me, tevî Kurdan mêze nake û tişta jê berpirsîyar nake, em her tiştî ji şaredarîyê û civaka sivîl hêvî dikin. Ji ber vê yekê, em bi vê dijwarîyê re rû bi rû ne. Ya duyem, çanda me, zimanê me, her tişt wêran bûye û divê em ji nû ve ava bikin.

Ez ê du tiştên pir kurt bibêjim. Pêşî, divê em, wekî sazîyeke Kurdî û wekî Kurd, tişta ku jê re "çanda çolterî" tê gotin, bi tevahî red bikin, ku yek ji hêmanên herî girîng ên prototîpa Kurd ya hatî wergirtin û faktorên sereke yên ku di vê wêrankirinê de dibin sedema asîmîlasyonê. Divê em bizanin ku avahîyên qaçax yên li dora Pira Deh Derî, ji bazirganîya tiryakê bigire heya firoşkarên wê, bi awayekî bi hev ve girêdayî ne û dîyardeyek e ku ji hêla van koman ve hatî çêkirin û tê domandin.

Ya duyemîn, ev yek li ser îmara avahîyên ku ji ber erdhejê zirar dîtine, tevî yên ku zirara wan giran û navîn e, têkildar e. Mînak, heke erseyeke 500 metrekareyî xwedî rûbera avahîyê 400 metrekare be, tê gotin ku ev ji plana îmarê ya nû kêmtir e û astengîyek ji bo veguherîna bajêr çêdike. Min dixwest vê mijarê bînim ziman, her çend ez ne piştrast bim jî.

Û Yahya Ogerê hêja, ji kerema xwe vê yekê wekî bersivekê hesab neke. Tûrîzma bawerîyê ji hêla Wezareta Tûrîzmê ve tê birêvebirin. Li Amedê ne heft gorên pêxemberan, dixwazî bila heftsed û heftê û heft bin, tu tûrîst nayê heya ku Wezareta Çand û Tûrîzmê geştekê organîze neke. Heta ku peymanek bi Rûsyayê re çênebûya ku tûrîstan bi tûrê bînin Antalyayê, tu Rûs serdana wê nedikir. Bê guman, divê em li dijî tiryakê şer bikin, lê ez bawer dikim ku ne adil e ku em xwe an civaka xwe ji bo vê yekê sûcdar bikin, li Rezanê, li ber derîyê dibistanan polîs hene û li ber çavên polîsan, zarokên temenbiçûk tiryakê difiroşin. Lewma ez dibêm em civaka xw esûcdar nekin.

Edîp Berk – Aborînas

Amed bajarê herî zêde bêdbext e li Tirkîyeyê ye. Ev rêjeya bedbextîyê bi îhtîmaleke mezin hîn bilindtir dibe, nemaze di serdema pergala qeyûm de. Bajar jî organîzmayên zindî ne. Ew avahîyên xwedî dîrok û çandî ne. Mînak, her şev li Amedê nêzîkî milyonek mirov radizên, sibehê şîyar dibin, dest û rûyên xwe dişon û derdikevin kolanan. Têkilîya wan rasterast bi şaredarîyê re heye. Ji ber vê yekê, ji bo me pir girîng û hêja ye ku şaredarî ji hêla kesên ku em hildibijêrin ve were birêvebirin. Dema ku Amed di têgihîştina me ya dîrokî de wateyekê diafirîne, ev wate di heman demê de vedigere nav bîranînên me yên kolektîf û kesane jî.

Amed, bajarek e ku di tevahîya dîroka xwe de êşên mezin kişandîye. Ji komkujîyên Ermenîyan bigire heta serhildana Şêx Seîd, îşkenceya Esat Oktay Yildiran di Girtîgeha Tîpa E'yê de, di hewldana darbeya 12'ê Îlonê de, heta kuştinên kiryarnedîyar û şewitandina gundan ên salên 1990'î, Amed bajarek e ku bi zanebûn û bi îrade piştgirî ji bo wê hatîye redkirin û ji bo ku li paş bimîne hewl hatîye dayîn. Helbestvanekî gotibû, "Amed ji bo me yar e, ji bo yên din jî derd e." Lê em bi her awayî nasname û çanda bajarê xwe diparêzin. Hilbijartina şaredarî û şaredarên me nîşana herî berbiçav a vê yekê ye. Armanca vê hilbijartinê manîpulekirina nasnameya vî bajarî ye.

Ez dixwazim pratîkek ku di dema pergala qeyûm de hatîye bicîhkirin vebêjim. Bo nimûne, gelek bajarên Tirkîyeyê rojên rizgarîyê hene. Di Şerê Cîhanê yê Yekem de, di dema dagirkirina Fransayê de rojên rizgarîyê, di dema dagirkirina Brîtanyayê de rojên rizgarîyê... Li Amedê, rojek rizgarîyê heye ku di dema pergala qeyûm de hatîye bicîhkirin. Ew me neçar dikin ku salvegera 700'emîn a fetha Amedê pîroz bikin. Li cîhanê tiştekî wisa bêwate tune. Bi taybetî bila em rê nedin ku nasname, kesayetî û dîroka Amedê were manîpulekirin. Ez bawer dikim ku em ê bikevin serdemekê ku ruhê "Em xwe û bajarê xwe bi rê ve dibin" nîşan dide.

Elif Turan – Seroka Odeyê Bijîşkan a Amedê ya Berê / Endamê Desteya Rêvebir a Amedsporê

Yek ji pirsgirêkên herî mezin ên bajêr pêgirtîbûna tiryakê ye. Em qala wê yekê dikin ku temenê bikaranîna tiryakê bi awayekî berbiçav daketîye. Di nav 10 mehan de li Farqînê nêzîkî 30 xwekuştin çêbûne. Dema ku me, rêxistinên sivîl ên bajêr, ev mijar bi baldarî lêkolîn kir, me dît ku hema hema hemû bi rastî bikarhênerên tiryakê bûne. Li Amedê, temenê bikaranîna tiryakê daketîye nêzîkî 9-10 salî. Çima ciwan berê xwe didin tiryakê? Ji ber ku, di rastîyê de, tiştekî din ji wan re tune ku bikin. Mixabin, ev der e ku ciwan "bextewarîya" xwe di tiryakê de dibînin.

Bi rastî, hin tişt hene ku em dikarin bikin da ku wê biguherînin. Di van demên dawî de gelek dîmen li ser medyaya civakî belav bûne. Zarok û ciwan li Parka Anzeleyê avjenîyê dikin. Di du sê mehên borî de, şaredarî hewl dide ku di vê dema kurt de her tişta ku dikare bike, nemaze ji bo zarok û ciwanan. Divê em van çalakîyan hîn bêtir zêde bikin. Divê em ciwanan teşwîq bikin ku bi werzîş û hunerê re mijûl bibin. Ji ber ku gava hûn bi werzîşê re mijûl dibin, hûn hormonên ku kêfê diafirînin çêdikin û hewcedarîya bi her madeyên zêde ji holê radikin.

Ne tenê li Amedê, di heman demê de li seranserê herêmê jî, eleqeya xelkê ji bo Amedsporê heye. Amedspor ne tenê werzîş an tîmek fûtbolê ye. Ew curbicur werzîşan pêşkêş dikin. Her wiha em ji şaredarîyê hêvî dikin ku piştgirîyê bide curbicur werzîşan. Amedspor kulûbeke werzîşê ye ku ne tenê li bajêr, di heman demê de li herêmê jî bale dikişîne. Ew wekî rêxistineke civaka sivîl jî tevdigere. Ger em piştgirîyê bidin vê kulûbê dema ku eleqe hebe, em dikarin eleqeya di nav ciwanan de hîn zêde bikin.

Zarok û ciwan bi rastî jî bi pêşbazîyên Amedsporê re eleqedar dibin. Ev yek dê rê li ber wan bigire ku ber bi qadên din ve neyên veguhastin.

Zekî Kanay – Komeleya Ekolojîyê

Çandinî û bikaranîna nebatan xwecihî di peyzajên bajarî de ji bo parastina avê û gelek sedemên din girîng e. Ez dixwazim girîngîya belavkirina van nebatan ji baxçeyên şaredarîyê û bikaranîna wan li seranserê bajêr tekez bikim. Ez pêşnîyaz dikim ku li her navçeyê muzexane werin avakirin ku çand û dîroka bêhempa nîşan bidin. Dê sûdmend be ku demildest bi rêxistinên civaka sivîl yên têkildar û ne têkildar re civînek li ser dagirkirin û avahîyên qaçax û dagirkirî were lidarxistin da ku em bi hev re nexşerêyekê ji bo çareserkirina vê pirsgirêkê pêş bixin. Wekî din, raya giştî bi rastî jî pir hay ji pêwîstîya statuya rewşa Çemê Dîcleyê haydar nîne. Ji ber vê yekê, girîng e ku DÎTAM di sê mehên pêş de civînekê amade bike. Girîng e ku daxuyanîyek li ser vê pirsgirêkê were weşandin ku ji hêla van rêxistinên civaka sivîl yên beşdar ve hatî îmzekirin û ev daxuyanî ji çapemenîyê, partîyên sîyasî, wezaretan û sazîyên têkildar re were şandin û bi vî rengî hişmendîya raya giştî di vî warî de zêde bibe.

Zahît Çîftkûran – Komeleya Şêx Seîd

Hin hevkarên me behsa kêmasîyên di xizmetên olî de kirin. Em heta sala 2016'an bi şaredaran re ji nêz ve xebitîn. Bêyî ku ol çi be, me der barê xizmetên olî de ji şaredarîyan tu zehmetî an astengî nedît. Şaredarîyan di planên xwe yên îmarê de cihên îbadetê û mizgeftan destnîşan kirin. Li ser van mijaran tu astengî nehat danîn. Wekî din, piştî ku qeyûm dest bi kar kirin, wan cihên ji bo jin û zarokan û heta xizmetên olî, veguherandin qursên Quranê û mizgeftan. An jî, wan ev cih ji me girtin û dan kes an sazîyên di bin kontrola xwe de.

Ya duyemîn, Hevşaredarên Şaredarîya Peyasê jî li vir in. Divê gelê me bizanibe ku mizgeftên ku ew lê îbadet dikin ên me hemûyan in. Ger tiştek hewce bike, em ê mizgeftê paqij bikin. Em ê heta sazîyên din ên olî jî paqij bikin. Xebatkarên Şaredarîya Peyasê vê dawîyê hemî mizgeftên navçeyê paqij kirin. Ez dixwazim ku şaredarî ji bo piştgirîya cihên îbadetê bêtir tiştan bikin.

Suleyman Îskenderogl, - Serokê Odayê Çandinîyê ya Yenîşehîr/Peyasê

Ez ê bi kurtasî li ser du mijaran bisekinim. Ya yekem, daxwazên cotkar û hilberînerên me hene der barê beşên gundewarî yên têkildarî qanûna bi hejmara 6360 a serokên daîreyên çolterîyê. Cotkar zehmetîyan dikişînin.

Ya duyemîn, hemû rê û arterên sereke yên navçeya me ya Yenîşehîrê diherikin Seyrantepeyê. Her kesê ku ji deverên din tê, wekî mînak ji Bedlîsê, neçar e ku biçe Seyrantepeyê. Li xaçerêya 450 Evlerê rêyek di bin Seyrantepeyê de heye. Rêya Seyrantepeyê bi xwe jî girtî ye, xaçerêya Mala Mamosteyan jî girtî ye. Bûlwara Xarpêtê ku li kêleka Bûlwara Mahabadê ye û Bûlwara Xarpêtê ya li ber Nexweşxaneya Lêkolînê girtî ne. Hemû ev bulvar û rêyên sereke qerebalix bûne, qerebalix bûne û bajar ji ber trafîkê xitimîye.

Sedat Yûrtdaş – Cîgirê Serokatîya DİTAM’ê (Moderator)

Ji kerema xwe, hevalên ku me mafê axaftinê nedaye wan ger pirs an şîroveyên we hebin, bi nivîskî ji me re bişînin. Hemû nîşeyên vê xebatê dê wekî pirtûkekê werin weşandin. Ji ber vê yekê em ê derfetê bibînin ku em berfirehî cih bidin. Bi rastî jî me dema xw eya dîyarkirî pir derbas kir. Ez her wiha pirseke nivîskî ya ku me wergirtîye kurteber dikim. Gelo lihevkirinek an hewldanek bi nûnerên hikûmeta navendî re der barê rêvebirina şaredarîyan de heye? Hûn ê çawa bigihîjin armancên vê reformê? Birêz Serra Bûcak. Em ê mafê gotinê bidin we ku hûn bi purxteyî hemû pirsan bibersivînin. Spas dikim.

Serra Bûcak – Hevşaredara Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê

Gelek spas ji tevkarîyên we yên hêja. Me nîşeyên hêja wergirtin. Demek pir kêm maye ku em budçeya girêdayî plana stratejîk çêbikin. Berî her tiştî, bila her kes piştrast be ku pênc salan, em ê bi baldarî bixebitin da ku beşên girîng ên hem plana stratejîk û hem jî budçeyê ji bo têkoşîna li dijî xizanîyê û ji bo rêveberîya şaredarîyê ya civakî ji bo vî bajarî veqetînin. Ev nayê wê wateyê ku em ê xizmetên bingehîn ên wekî binesazî, av, paqijî, lênêrîn û tamîrkirinê nekin. Em ê heta radeyekê xizmetên pêşîn bidin pêş û beşek girîng a enerjî û budceya xwe ji bo tiştên me behs kirin xerc bikin; û em ê projeyan û destpêşxerîyan pêk bînin. Ji ber ku, wekî ku îro di vê hêwanê de jî eşkere bû, divê ev qada ji nû ve werin sererastkirin.

Li holê agirek heye. An ev agir dê me bişewitîne, an jî em ê ji wê bajarekî nû, Amedeke nû ava bikin. Me çavê xwe li ser ya paşîn danîye û em ê bi hemû şaredarîyên xwe û civaka sivîl re bixebitin da ku bi hev re bigihîjin ya paşîn. Ji vê rewşa wêranker, bê guman em ê li dijî xizanîyê bitêkoşin, hewcedarîyên civakê bicîh bînin û Amedê bigihînin asta wê ya îdeal, ne tenê ji perspektîfa me lê di heman demê de ji perspektîfeke gerdûnî jî. Îro, Amedbûn nasnameyeke girîng e. Lê di heman demê de erka me ye ku em vê nasnameyê mezin bikin û pêşve bibin. Em nikarin tenê ji ber ku ev nasnameya me heye hebûna xwe bidomînin. Ev yek pir eşkere ye. Wêranî, erdhej, krîz û pirsgirêkên civakî yên ku me jîyane û dîtine eşkere kirine ku wekî rêveberîyên herêmî, divê em pêvajoyeke avaker bişopînin da ku vê rewşê çareser bikin.

Wekî Hevşaredarên Bajarên Mezin ku bi %64.09’ê dengan hatine hilbijartin, me ev soz da: Em dixwazin bi nêzîkatîyeke berfireh a şaredarîvanîyî xizmeta her kesî bikin. Em li pişt vê yekê ne û em ê berfireh bin. Em ê guh bidin her kesî. Dema ku em vê dikin, em ê carinan civînên dirêj li dar bixin, lê em ê hevsengîyê biparêzin. Di hefteya ku em civînên dirêj li dar dixin de, em ê êvaran serdana karsazîyên herêmî bikin. Dema ku em van serdanan biqedînin, em ê vegerin şaredarîyê. Em sê meh û nîv in bi vî rengî hevseng dixebitin. Bi şaredarîyek ewqas wêranbûyî re, erka me ye ku em avahîya wê ya hundurîn sererast bikin. Em pabend in ku projeyên pêwîst ji bo vî bajarî eşkere bikin, bi gel re bicivin û guh bidin wan. Em dixwazin tevahîya hefteya xwe û roja xwe dabeş bikin ji bo hemû qadan.

Wek Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê, em dixwazin Midûrîyeta Jîngeh û Bajarsazîyê, Tenduristîyê, Walîtî, Midûrîyeta Perwerdehîya Neteweyî û hemû sazîyên din ên fermî yên vî bajarî re bicivin, da ku pirsgirêkên xwe bi wan re parve bikin û nîqaş bikin. Me ev yek ji destpêkê ve bi eşkereyî gotîye. Em vê yekê tenê wekî rêbazeke sîyasî an jî wekî xebateke dîplomatîk nabêjin; em vê yekê dizanin ku ev pêdivîyeke krîtîk e. Wekî ku we jî dîyar kirîye, rêveberîyên herêmî, ji bo çareserkirina vî bajarî û pirsgirêkên wê yên mezin bi tena serê xwe ne xwedî kapasîteya bersivdayînê ye û ev ne pêkan e. Ev li

tu devereke din a cîhanê tune ye û li Amedê jî çênabe. Ji ber vê yekê, nêzîkatîya me ne dîplomatîk e; ew bi tevahî li ser bingeha pêdivî û divêtîyê ye.

Wekî ku me heta niha kirîye, em ê di nêzîkatîya xwe ya li hember hemî sazîyên fermî de, wekî hilweşandina avahîyên metrûk bi Midûrîyeta Jîngeh û Bajarsazîyê ya Bajêr re û bi Midûrîyeta Tenduristîyê ya Bajêr re li ser tenduristîya gel û mekanîzmayên pêşîgirtinê û bi Midûrîyeta Perwerdehîya Neteweyî re jî li ser têkoşîna li dijî pêgirtîbûna tiryakê û gelek mijaran de biaxivin. Em ne tenê di civîn an hevpeyvînên xwe de, lê di heman demê de li deverên din jî vê yekê tekez dikin. Ez endamê encumena daîmî ya Yekîtîya Şaredarîyên Tirkîyeyê me, digel Hevşaredarê Bajarê Mezin ê Mêrdînê Ahmet Turk. Min ev yek li ser navê Amed di du civînên encumenên daîmî yên ku ez heta niha beşdarî wan bûm de anî ziman. Min girîngîya vê têkilîyê bi hikûmeta navendî û sazîyên wê re tekez kir. Her çend ne bi qasî DEM Partîyê giran bin jî, şaredarîyên Partîya Gel a Komarî jî heta radeyekê ji vê pirsgirêkê dikişînin û me hewcedarîya pêşxistina hin rêbazan di vî warî de nîşan daye.

Demokrasîya herêmî jî me pir eleqedar dike. Min ev têgeh çend caran li Yekîtîya Şaredarîyan anî ziman. Min fêm kir ku ev hevoka min li dîwêr dikeve. Dema ku em behsa demokrasîya herêmî dikin, ew wekî ku tenê pirsgirêka Kurd çareser dike tê fêmkirin. Ji ber vê yekê, em li vir mijara demokrasîya herêmî bidomînin da ku her kes li vir fêm bike ka ew çiqas têgeheke girîng û gerdûnî ye. Wisa dixuyê ku divê em bêtir li ser demokrasîya herêmî nîqaş bikin. Di van heşt salan de çi qewimî? Em ber bi pêvajoyeke ku mafê gotinê ji holê hat rakirin û mafê mudaxilbûnê ji holê hat rakirin. Em dikarin çi bikin di pêvajoya UNESCO'yê de civaka herêmî, civaka sivîl, şaredarîyan, odeya mîmaran û rêveberîya qadê daxilî vê bikin? Em dikarin çi bikin da ku civaka herêmî, civaka sivîl, şaredarî, Odeya Mîmaran xwedî gotin bin, ne tenê Midûrîyeta Jîngehê? Em dikarin çi bikin da ku civakên herêmî, civaka sivîl û şaredarîyan ji çîna taşeronî ya midûrîyetên bajêr ên li ser navê hikûmeta navendî biryaran pêk tînin derxin? Divê em vê taşerontîyê red bikin. Rê û rêbaza vê yekê divê ew be ku em werin cem hev û girîngîya demokrasîya herêmî, rêveberîya demokratîk û avakirinê nîşan bidin.

Em di hemû rexneyên we yên der barê paqijî û veguhastinê de hevfikir in. Em di demek pir dijwar re derbas dibin. Bajarê me qirêj e û nikare xwe bide ser hev Hem qirêj e û hem jî pêdivî bi lênêrîn û tamîrkirinê heye. Li alîyekî qirêjîya jîngehê, li alîyê din avahîyên hilweşîyayî,û li alîyê din jî avahîyên metrûk... Bajar bi rastî jî pêdivî bi xebatên lênêrîn û tamîrkirinê yên girîng heye. Hevalekî me yê li vir niha pêşnîyaz kir ku hemû hevserok, hemû karmend werin cem hev û seferber bibin. Em lis er vê fikirîn, lê ji ber ku dê veguhere çalakîyeke populîst me dev jê berdaye. Divê em hemû rêyên din bibînin û xwedî lê derkevin.

Niha yekîneyeke têkilîyên derve ya me tune ye, lê em yekîneyekê ava dikin. Em dixebitin ku hem yekîneyeke têkilîyên derve û dîplomasîyê û hem jî ofîseke projeyan di nav şaredarîya mezin de ava bikin. GABB jî heye. Em dikarin di nav GABB'ê de ofîseke projeyên hevbeş ava bikin. Bi rastî, çima divê bi Odeya Bazirganî û Pîşesazîyê ya Amedê re ofîseke projeyên hevbeş nebe? Divê em van mekanîzmayan berfireh bikin û li ber çavan bigirin.

Bê guman, civîn hêja ne, lê em dizanin ku em bi her dem civînan nikarin bigihîjin tu derê û divê em li cihekî bisekinin û tevdîran bigirin.

Meseleyeke me ya bı vî rengî jî heye: Pergala rêhesinê 20 sal in di rojeva vî bajarî de ye. Mirov dikare bibêje ku ev cureyeke serhişkî ye, xeyalek e. Ev proje di Bernameya Veberhênana Serokkomarîyö ya 2025'an de cih girtîye. Dibe ku hûn bibêjin ku Amed divê dev jê bernede, ji ber ku projeya pergala rêhesinê jixwe di bernameyê de ye. Gelek sedem hene. Dibe ku hûn bibêjin ku bila Amed êdî bibe bajarekî hêdî, bila gelemşeya ev qas mînîbusan bi xeteke tramvayê aram bibe. Dibe ku hûn bibêjin, "Bila bi xeteke tramvayê sînordar nemîne, di 15 salên pêş de 4 rêyên tramvayê yên din amade bikin ku tevkarîyê li tevahîya gihanîya bajêr bike. Bê guman, em dizanin ku xeta tramvayê ya 14.5 kîlometre û

rêyeke bi tena serê xwe dê ji bo çareserkirina trafîkê û tevahîya pirsgirêka gihanîyê têrê neke. Lêbelê, heke em gav, perwerde û bernameyên ku dê çanda tramvayê û hemû alîyên neyînî yên gihanîyê di sê sal û nîvan de biguherînin, ji niha dest pê bikin û tramvayê di sê sal û nîvan de temam bikin, em ê bikaribin bi hewldaneke berfireh vê yekê çareser bikin.

Her wiha me sê civîn bi şîrketênşêwirmendîyê, muşawirtîyê li dar xistin. Em ji niha ve li ser tîma ku em ê ava bikin difikirin. Profesor û serokên odeyên ji Beşa Endezyarîya Înşeatê ya Zanîngeha Dîcleyê serdana me kirin. Divê em bi kesên têkildar re şêwir bikin û rûnin û bi wan re biaxivin. Divê em van civînan bidomînin. Divê em bi karsaz, veberhêner û endezyarên sivîl re hevdîtinan bikin. Divê em werin cem hev da ku em bigihîjin serkeftinê.

Her wiha divê em van xalan jî li ber çavan bigirin: Gelo em dikarin di nav Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê de avahîyek, wekî desteyeke şêwirmendîyê, bi taybetî ji bo projeyên binesazîyê yên vîzyoner, mezin û pêşerojê yên ku bajar eleqedar dikin, ava bikin? Divê em li ser vê yekê bifikirin ka em çawa dikarin vê yekê bixebitînin û bêyî ku dijwar be, hêsan bikin. Em dixwazin berî ku em plana stratejîk eşkere bikin, dîsa bi we û hemû sazîyên têkildar re bicivin. Em vê mekanîzmaya çavdêrîyê di vî warî de girîng dibînin û ji bo vê çi ji destê me bê em ê bikin.

Konseya Bajêr, hûn çawa lê dinerin binerin, heşt sal in li vî bajarî tune bû. Em li ser avakirina lijneyeke rêveberîyê, bi berçavgirtina rêbernameyên kevin, fikirîn. Hevkarên me gelek hewl dan, civînên amadekarîyê li dar xistin û serdana sazîyan kirin. Heta roja civîna Konseya Bajêr, hin sazîyên me heta li ser zêdekirina endaman li komîteya rêveberîyê jî fikirîbûn. Heta civîna Konseya Bajêr, dema ku me dît ku hin sazî tevlî lijneya rêveberîyê dibin, girîngîya mijarê eşkere nebû. Ev têgihîştî û normal e. Em kesî sînordar nakin. Em qet sînorekî li ser lijneyeke rêveberîyê, wek 26 an 35 endaman, ferz nakin. Berevajî vê, heke em bawer bikin ku ew ê ne dijwar be, em dikarin wê hîn bêtir berfireh bikin. Me ev xal di civîna Konseya Bajêr de jî anî ziman.

Me tiştekî din jî anî ziman: Hevserokên Konseya Bajar divê ne Hevşaredarên Şaredarîya Bajarê Mezin bin. Me ev mijar berî civîna Konseya Bajêr xist rojeva sazîyan. Me bi rêveberîyên herêmî û civaka sivîl re nîqaş kir. Di vê qonaxê de û di encama danûstandinan de, ji ber ku Konseya Bajêr di heyama heşt salan a qeyûm de, demeke dirêj kom nebûbû û ji ber ku Şaredarîya Bajarê Mezin wekî garantor û ajokarê vê pêvajoyê dê sûdmend be, me pêşnîyaza ku hevşaredar ji bo demekê serokatîya xwe bidomînin. Ev yek hat qebûlkirin. Me dizanibû ku hevserokên Konseya Bajêr dikarin dînamîkên bajêr çêtir nîşan bidin. Me ev yek di roja civînê de anî ziman. Me got ku em ê vê yekê ji bo demeke demkî bikin, bila salek be. Dema ku Lijneya Rêveber a Konseya Bajar, encumenên têkildar bicivîne û wan bixe merîyetê, em ê kêfxweş bibin ku erkên hevserokên Konseya Bajêr radestî wan bikin. Em naxwazin barekî wisa hilgirin ser xwe. Wekî din, em qet naxwazin ku Konseya Bajêr wekî sazîyeke şaredarîyê tevbigere. Em dixwazin ku Konseya Bajêr mecliseke bajarî ya serbixwe be. Em dixwazin ku ew platformek be ku dîplomasîya bajêr, ji nûnerên taxan bigire heya partîyên sîyasî, pêş bixe û rêberîya wê bike û misoger bike ku meclîs bi bandor dixebitin. Em dixwazin ku ew di astekê de be ku plan, raman û polîtîkayên berfireh ji bo bajêr derkevin holê. Em ê li benda Îlona 2024'an nemînin ku Konseya Bajar bicivînin. Vîzyona me ew e ku demildest Konseya Bajêr bicivînin û xebata xwe bidomînin.

Dogan Hatûn – Hevşaredarê Şaredarîya Mezin a Amedê

Ez ji we hemûyan re spas dikim ku we kêmasîyên ku me nedîtine an jî bala xwe nedane wan destnîşan kirin û pêşnîyaz pêşkêş kirin. Şefafî di nav şaredarîyê de pir girîng e. Em hemû mijarên ku ji meclısa

şaredarîyê re tên şandin li ser malpera şaredarîyê parve dikin. Ev yek dihêle ku kesên ku di civînên meclısê de amade nînin bizanin ka çi biryar tên girtin. Ya duyemîn, me ji Odeya Şêwirmendên Darayî xwestîye ku me ji derve ve bişopînin, danûstandinên me yên darayî, îhaleyan, kirîn, qezenc û windahîyên me binirxînin û raporên têkildar ne tenê bi şaredarîyê re, di heman demê de bi raya giştî re jî parve bikin. Di vi wari de, şefafî di xebata me de pir girîng e.

Ji me re gotin, "Heke hûn ji kesên çekdar ditirsin, vê yekê nekin." Em natirsin; em naxwazin zirar bigihê kesî. Armanca me ew e ku em vî bajarî di rewşa wî ya herî baş de zindî bihêlin. Lêbelê, di vê gavê de, her devereke pirsgirêkan li bajêr di bin rehma hin koman de hatîye hiştin. Ji ber vê yekê, me got, "Werin em bi rêxistinên civaka sivîl re bi wan re biaxivin." Em ji çareserkirina vê pirsgirêkê natirsin; em nehatine vî meqamê ku em bitirsin.

Pirsgirêkeke din jî veguhestina milkên şaredarîyê bo sazîyên din e. Milkên şaredarîyê bêpere ji bo Dîyanetê, Karên Avê yên Dewletê (DSÎ), Midûrîyeta Ciwanan û Werzîşê ya Bajêr, Midûrîyeta Perwerdehîya Neteweyî û sazîyên din hatin veguhestin. Çawa ku şaredarî dema ku plana stratejîk a dewletê û planên budçeya hikûmeta navendî tên amadekirin, budçeyên xwe hene, DSÎ, Dîyanet, Midûrîyeta Perwerdehîya Neteweyî û sazîyên din jî wisa ne. Çima ev sazî ji budçeyên xwe avahîy an sazîyan ava nakin? Milkên ku ji hêla şaredarîyan ve ji bo armancên giştî, wekî perwerde, çand û huner hatine çêkirin, bi tevahî ji şaredarîyên me hatine girtin û dane sazîyên din. Em daxwaza vegerandina milk û avahîyên xizmetê yên ku hatine veguhestin dikin. Em ne li dijî qursên Quranê ne. Ger welatîyên me der barê qursên Quranê de pêşnîyazek ji me re bikin û ji me re bibêjin ku li ku derê hewcedarîya wan bi wan heye, em ê bi kêfxweşîyeke mezin vê yekê bikin. Nîyeta me tune ku qursên Quranê bigirin; em tenê dixwazin milkên ku me bi çavkanîyên xwe ava kirine û tavilê veguhastine wan bistînin. Ev milk ên gel in; ew bi pereyên gel hatine çêkirin. Dîyanet, budçeyeke xwe heye; heke nebe, rêbazên wê yên din hene. Em dixwazin ev milkên ku bi çavkanîyên şaredarîyê hatine çêkirin, ji nû ve werin vegerandin da ku em karibin di her warî de xizmeta gelê xwe bikin û em daxwaz dikin teserûfa wan tenê aîdî me be.

Dema ku em daxwaz dikin ku avahîyên ji bo Midûrîyeta Ciwanan û Werzîşê ya Bajêr an Midûrîyeta Perwerdehîya Neteweyî hatine veguhastin û qadên li parkan ên dewrî Midûrîyeta Tenduristîyê ya Bajêr hatine kirin werin vegerandin, qey em dibin dijminê tenduristîyê û yên din? Em dijminê kesî nînin; em dixwazin ku gelê me di van sazîyan de ji van tesîsan sûd werbigire. Em rêzê li hemû olan digirin û tu dijminatîya kesî nakin. Em amade ne ku ji bo cihên îbadetê, bêyî ku ola wan çi be, xizmetê bidin. Lê divê kes me wekî dijminên Îslamê nîşan nede. Em tenê daxwaza van milkên ku ji bo berjewendîya van kesan hatine çêkirin lê hatine desteserkirin dikin. Ev mafê me ye û pêdivîya me bi wan heye.

Me lêkolîneke berfireh a gengazbûnê li ser pergala rêhesinê pêk anîye. Ji hêla teknîkî ve, dema ku em qonaxên duyemîn, sêyemîn û çaremîn bihesibînin, li Tirkîyeyê tu projeyeke din a pergala rêhesinê bi lêkolîneke gengazbûnê ya bi qasî vê berfireh tune ye. Lêkolîna gengazbûnê ne tenê ji bo metroya bajêr hatîye kirin. Ji ber ku bin erdê bi tevahî ji bazaltê pêk tê û kolandina ji bo metroyê dijwar e û budçeyek girîng hewce dike. Em dibêjin ku lêçûneke wisa ji bo kolandina bin erdê ne hewce ye; em dikarin pergala rêhesinê li ser erdê ava bikin.

Çavkanîyên me hene ku em pêdivîyên pêwîst ên wekî lepik û cilên werzîşê ji bo berhevkarên kaxizên bermayî peyda bikin. Em dikarin hem lepik û hem jî cilên werzîşê ji wan re peyda bikin. Ez ê li ser vê yekê lêkolînekê bikim û li ser wê bisekinim.

Pêşnîyaza der barê peyzaja bajêr de ku bikaranîna nebatên endemîk ên li herêmê şîn tên jî di nav xwe de digire, pir hêja ye. Bê guman, em dikarin bikin; ew ê ji bo vî bajarî xizmeteke hêja be.

Di dawîyê de, der barê pêşnîyaza ku divê her kes ji bo çareserkirina pirsgirêkên bajaêr were teşwîqkirin, ez dikarim vê yekê bibêjim. Karsazekî li bajêr serdana şaredarîyê kir. Di dema serdanê de, me ramanên xwe yên ji bo avahîyên civakî li bajêr şîrove kirin. Wî got, "Ger hûn li ser vê mijarê kampanyayê bikin, ez ê yekem kes bim ku beşdar bibim û piştgirîya darayî pêşkêş bikim." Me van mijaran bi Odeya Bazirganîyê ya Amedê û rêxistinên din ên civaka sivîl re jî nîqaş kir. Bi kurtasî, em di nav şaredarîyê de ne, lê em di nav wê de winda an jî asê nemane. Em di her warî de planan çêdikin û dixebitin. Nîyeta me ew e ku di her warî de serkeftî bin. Em ê bi hev re serkeftî bibin. Careke din spas dikim.

Sedat Yûrtdaş - Cîgirê Serokatîya DÎTAM'ê (Moderator)

Ji we hemûyan re gelek sipas! Ji niha ve ji bo axaftina girtinê ez mafê axaftinê didim serokê me yê DÎTAM'ê Mesût Azîzoglû.

Mesut Azîzoglû - Serokê DÎTAM'ê

Me 4 saet derbas kirin. Spas ji bo sebira we. Lêbelê, rastîya ku civîn ji çar saetan zêdetir dom kir nîşan dide ku pêdivî ye ku li ser xizmetên herêmî nîqaş were kirin. Ev civîna yekem a Tora me ya Çavdêrîya Herêmî bû. Tişta ku îro hat nîqaşkirin bi armanc û rêbaza Tora Çavdêrîya Herêmî re baş li hev dihat û jixwe me tiştekî wiha pêşbînî kiribû. Em ê piştî sê mehan dîsa bi civaka sivîl re bicivin. Ez spasîya xwe ya dilsoz ji Şaredar Serra û Şaredar Dogan, şaredarên navçeyên me, nûnerên rêzdar ên civaka sivîl, serokên wan, rêvebirên wan û hevkarên me yên çapemenîyê re pêşkêş dikim. Bi hêvîya em di civîna bê de hev du bibînin.